DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

**https://rantey.org**

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

# SIWARÊ EWRAN

ÎSMAÎL DÎNDAR

ROMAN




evrensel ilk gençlik kitaplığı

ri - https://rantey.org

evrensel ilk gençlik kitaplığı

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Îsmaîl Dîndar

# SIWARÊ EWRAN

Roman

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

**DOĞA BASIN YAYIN**
**Dağıtım Ticaret Limited Şirketi**
Tarlabaşı Blv. Kamerhatun Mah. Alhatun Sk. No: 25 Beyoğlu / İstanbul
T: 0212 255 25 46 F: 0212 255 25 87
www.evrenselbasim.com – info@evrenselbasim.com

Evrensel Basım Yayın **563**
Rêza Pirtûkên Kurdî **21**
Pirtûkxaneya Nûciwaniyê **1**

**Siwarê Ewran: Îsmaîl Dîndar**

Dîzayna Bergê: Devrim Koçlan
Logo: Vahit Akça
Wêneyê Bergê: Mehmet Kapçak

**ISBN 978-605-331-019-8**
© Evrensel Basım Yayın 2014 – Sertifika No: 11015

Çapa Yekemîn: Reşemî 2014 • İstanbul

Çap: Ezgi Matbaacılık Tekstil Pors. İnş. San. Tic. Ltd. Şti.
Sanayi Cd. Altay Sok. No: 14 Yenibosna / İstanbul • Sertifika No: 12142
T: 0212 452 23 02 – www.ezgimatbaa.net

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# SIWARÊ EWRAN

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Îsmaîl Dîndar

Di sala 1965'an de, li gundekî Midyadê (Qertmîn) ji dayik bû.

Dibistana seretayî li gundê xwe xwend. Di navbera salên 1975 û 1981' ê de, li Erxenê 6 salan dibistana Dicle Öğretmen Lisesi, leylî xwend. Di navbera salên 1981 û 1983'yan de li bajarê Çanakkale, dibistana bilind a mamostetiyê kuta kir. Di meha reşemiya 1984'an de li bajarê Mereşê dest bi mamostetiya dibistana seretayî kir. Aniha li Amedê karê mamostetiyê dike. Bavê 2 kur û keçekê ye.

Ji sala 2001'ê ve bi nivîsa kurdî re têkildar e. Nivîs û çîrokên wî di rojnameyên Azadiya Welat, Gündem, Açılım, Radikal 2, Günlük, Evrensel û kovarên W, Çîrûsk, Nûbihar, Emekçiler, Özgür Kadının Sesi û Tîroj de der çûn.

**Berhemên wî.**

Hemû Demsal Payîz in: Weşanên Belkî, Amed, 2007, çîrok.

Kewên Birçî: Weşanên Avesta, Stenbol, 2010, çîrok.

Palûte: Weşanên Evrensel, Stenbol, 2011, çîrokên zarokan.

Marî: Weşanên Avesta, Stenbol, 2012, çîrok.

**Werger:**

Pembûyê Reş: Muzaffer İzgü, romana zarokan, weşanên Evrensel, Stenbol, 2011

Masiyê Reş ê biçûk: Samed Behrengî, romana zarokan, weş. Evrensel, Stenbol 2011

Dewlet: Vladimîr Îlyîç Lenîn, Weşanên Evrensel, Stenbol-2012

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# SIWARÊ EWRAN

Di wan rojên payizî ku dinya hin bi hin sar dibû de, ez û kalê xwe li hewşa mala me, li ber tava rojê ne. Li ser merşa ku bapîra min ji mûyên bizinan ristiye, pişta xwe dide dîwarê kevirî, ez jî serê xwe datînime ser çokên wî.

Berê min li rêzeçiyayên ku gundê me di quntara wan de hatiye avakirin. Çiya, mîna kelehan, pêl bi pêl dirêj dibin. Çiyayên ku di seranserê payîz, zivistan û biharê de bi mij û dûman in. Ewrên reş û tarî di her sê demsalan de tên bi yek carê serê çiyayên bilind dadiqurtînin. Ku ewrên reş, ji ser çiyayan bi dûr dikevin, vê carê, berfa qeşagirtî spî dike. Mîna ku mirov lihêfa reş ji ser doşeka spî rake. Ji dawiya payîzî, heta dawiya meha pêşî ya biharê berf ji serê van çiyayan kêm nabe. Li hin cihan, di siha lat û zinaran de, di cihê ku tava rojê nagihiyê de, ev berf heta dawiya biharê jî nahele. Kalê min dibêje:

– Li hin çiyayan, berfa nû digihe berfa kevin a sala berê. Wisa ku berf qeşa digire,  li ser hev dibe mîna kêvir.

Xort di germa havînê de, ji bo qetek berfa hişk peyde bikin û ji kal û pîrên nexweş re bînin, berê xwe didin lûtkeyên çiyayan, lat bi lat, zinar bi zinar, li cihê xewle digerin.

Ez  gelekî serê wan çiyayan û bêtir jî pişt çiyayan meraq dikim. Gelo pişt van çiyayan deşt e yan dîsa çiyayên mîna van çiyayan e? Ev yek tim di xewn û xeyalên min de ye. Çi cara ku min ji kalê xwe pirsiye:

– Kalo dawiya van çiyayan li kû derê diqede?

Kalê min jî weha gotiye:

– Ev çiya diçin û hey diçin...


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ku mirov li gorî bersiva kalê min bifikire, seranserê dinyayê çiya ne. Ne serî heye û ne jî binî.

Di rojên havînî yên germ de, kalê min bi destê min digire û em diçine bin siya dara gûzê ya ku ava bestê di bin siya wê re diherike. Best, mîna marekî, di kêleka gund re, di nav bexçe û zeviyên me re, di nav lat û zinaran re, newal û newal, di her sê demsalan de bi nazenîn diherike, tenê di demsala biharê de av li ser hev kom dibe û bi coş e. Ji binê her latê avzêmkek diteqe, ava avzêmkan, heta serê havînê, mîna memikên dayikekê, besta me xwedî dikin. Derûdora gund çiya, nava gund jî bêtir kevir û dar in. Du rêze çiya, di bakûrê gund de, pir nêzîkî hev dibin. Ava bestê, li vê tengavê, li ser hev kom dibe û xurt diherike. Ku berfa li serê çiyayan dihele û şape radibe, em têne vê tengavê, li kêferata avê temaşe dikin. Av har û dîn dibe. Kevir, lat, şax û qurmên daran, mîna gokekê dixindirîne, li bin guhê hev dixe û di ber xwe re dibe.

Kalê min, bi kopalê xwe darên fêkiyan nîşanî min dike:

– Ku ne ji vê avê bûye, dê gundê me rût û tazî bûya. Ev xoxên mîna petêxan, mişmişên şêrîn, hejîrên hingivîn yek jî ber nedigirt. Firingiyên me jî wisa sor û tirş nedibûn.

Besta me zivîstanan qeşa digire carinan. Havînan ava wê kêm dibe lê li ber xwe dide û tu carê ziwa nabe. Ew tu carê zeviyên me, bexçeyên me, sewal û ajalên me tî nahêle. Jixwe ku bihar tê, dîsa, ji nû ve dîn û har dibe; ava wê zêde dibe, di cihê xwe de hilnayê. Di biharê de rengê xwe jî diguherîne besta me, dibe soreke qehweyî. Dawiya vê bestê jî dipirsim ji kalê xwe, ew ji bo bestê jî dibêje:

– Ava vê bestê diçe û hey diçe...

Çiya jî, best jî diçûn û hey diçûn. Lê min dixwest fêr bibim, diçine kû derê?


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Û tu carê meraqa min kêm nedibû. Ne ev bersivên bavê min û ne jî gotinên kesên dî, ez têr nedikirim. Çiya her tim di bîra min de bûn. Min him meraq dikir û him jî ez ji wan çiyayan ditirsiyam. Lê ev tirs, ne tirseke wisa bû ku li ber meraq û xwesteka min bibe asteng. Tenê ku min di xewn û xeyalên xwe de, ez li ewran siwar dibûm û digihiştime lûtkeyên bilind, weke razekê, laşê min dilerizî. Peroşek dihat hemû bedena min werdigirt.

Min dizanî ku gelek ajal jî hene di wan çiyayan de. Jixwe çiya mala wan ajalan bûn. Loma her tim min li sohbeta mezinan guhdarî dikir. Guhê min li ser wan bû. Ku min didît çend kes li ba hevdu civiyane, ez dibeziyam cem wan. Ji jiyana rojane dest pê dikir axaftina wan û her weha bi serpêhatiya çiya û zeviyan, ajalên ku li nav zevî û çiyayan hatine dîtin. Taybetmendiyên cîhana ajalan. Ku di nav axaftinan de kesên nêçîrvan jî hebûna, ev axaftin ji bo min balkêştir û girîngtir dibû.

Ev ajal, çi dixwarin, çi vedixwarin, li kû derê radizan? Xwe ji sermayê, ji germê û ji tevan girîngtir ji êrîş û xetereyên ajalên dî, ji êrîşên mirovan çawa diparastin? Ev her tim mijara ramanên min bûn. Li ser agahiyên ku ji mezinan fêr dibûm, min di hişê xwe de gelek tişt ava dikirin.

Lê ne hewce ye ku ez veşêrim, nav û mijara van ajalan, her tim tirsek jî dikire dilê min. Di nav her ramanê de tirsek hebû teqez. Di her axaftina li ser ajalan de, mezinên me qala kuştinê dikirin. Ajal geh dihatin kuştin, geh direviyan. Carina birîndar û carina jî sax bi dest diketin. Û ew luleya hesinî ya ku teqez bi dîwarê her malê ve hilawestî bû piranî ji bo van ajalan bû. Û mezinên me, ew luleyên hesinî yên ku dema diteqiyan dengekî bilind û tirsnak ji wan belav dibû, bi milê xwe ve hiladiwestin, tûrik bi mlê xwe ve dikirin û çaro çaro pênco pênco berê xwe didan wan ajalan. Berê xwe didane nav çiyayên biraz. Û hingê min xeyala ku ez bibim kevokek û bifirim dikir. Perê xwe li bayê sivik xim û gaveke zûtir biçim cih û warên ajalan. Ji wan re bibêjim; va ye mirovên dilxerab tên ji bo kuştina we. Zû birevin, biçin cih û warên dûr. Xwe li cihên asê, xewle û nepenî veşêrin...


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Jixwe ku demsal zivistan bûya û berf li ser erdê bûya, hingê nêçîrvan bêtir dibûn û her roj berê xwe didane çiyayan. Heta ku hin ji wan bêyî ku çekan bi xwe re bibin, wisa destevala diçûn. Hingê xeyalên min bêtir dibûn, tirsa min mezintir dibû. Zilamên gundê me, bi yek carê êrîşî çiyê dikirin û di wê sermaya zivistanê de, bi ser ajalên birçî digirtin.   Ajal, li serê wan çiyayan birçî bûn, şev û rojê ji bo piçek xwarin li vî alî û li wî aliyî digeriyan. Nêçîrvan jî bi kêf û eşq, bi mebesta ku van ajalan bi dest bixin, diketin ser riya çiyayan.

Gava zilam ji çiyê vedigeriyan, dinya dibû tarî. Zarok dibeziyan pêşiya bavên xwe. Destê xwe diavêtin tûrikên wan. Tûrikên ku bi kew û kîvroşkan tije bûn. Him min meraq dikir û him jî min destê xwe nediavête tûrika bavê xwe. Min çi qasî dixwest ku tûrika bavê min vala be. Lê mixabin weke yê her zilamê ji  gundê me, tûrika bavê min jî bi kew û kîvroşkan tije bû.

Ku dibû sibeh, hemû zarok em li qada li binya dibistanê kom dibûn. Ji kelecana dilê xwe zarok berî ku taştê bixwin, dihatin qada lîstikê. Her kesî, bi serbilindiyeke qure hejmara kew û kîvroşkên ku bavê wan, an ap û xalên wan girtibûn, digotin. Bi dengekî bilind:

– Bavê min şeş kew û sê kîvroşk girtin.

– Apê min pazdeh kew anîn.

– Xalê min û kekê min kîsek tije kiribûn.

Min qet yên bavê xwe nedigot, ligel ku min dizanîbû jî. Ligel ku min ew, di destê diya xwe de, yek bi yek jimartibûn jî. Dûre dibû qala xwarina goştê wan:

– Errik, çi qasî xweş bû goştê kewan!...

Ew ling û niklên sor mîna ku hinekirî bûn, ew perên gewr bi xetên reş neqişandî... Yek bi yek di ber çavên min de diçûn û dihatin.

– Kîvroşka ku bavê min girtibû, bi qasî berxekî bû.

Guhên dirêj, ew çavên ku bi mirîtî jî diberiqîn, di ber çavên min de diçûn û dihatin.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Kew, kîvroşk, rovî, gur, hirç hemû ajalên ku di nav wan çiyayan de dijiyan, ji min dûr bûn û ji me bi dizî dijiyan. Ku dibû şev, ku xewa şêrîn bi ser çavên min de digirt, êdî ez diketme nav cîhana wan.

Kew di asîmanan de difirîn û hey difirîn. Ku diwestiyan, dihatin li ser milên min vedinîştin. Min bi mista destê xwe çeng û perên wan miz didan. Hingê dest bi xwendinê dikirin. Bi wî dengê xweş î şêrîn, ji nişka ve ez ji wê xewa xweş, ji xewna xwe ya ku min nedixwest qet biqede şiyar dibûm.

Kîvroşk, di nav lat û deviyan de didane pey hev. Ku diwestiyan dihatin li ber serê min, di ber balîfê de xwe dirêj dikirin. Ku min dixwest, ez rabim xwe çengî wan guhên dirêj û xweşik bikim, dîsa çavên min ji ser hev diçûn û ez vedigeriyama cîhana rastîn a ku min qet nedixwest.

Hin nêçîrvan, di demsalên dî de jî diçûne nêçîrê. Diçûne nêçîra kew û kîvroşkan. Hin jê bi tivingê, hin bi defkan kew digirtin. Ji mûyên dûvên hespan defk çêdikirin. Kewên xwe yên kedîkirî jî datanîne ber kevirekî. Kewên kedîkirî, ji yên çiyê re dixwendin. Ku yên li çiyê dihatin cem kewên nêçîrvanan, an diketin defkan an bi tivinga nêçîrvanan dihatin kuştin.

Havînî jî nêçîrvan diçûne nêçîra çêlkewan. Di nav deviyan de li kewên kurk digeriyan. Ku mêkew çêlîkên xwe derdixistin çêrê, nêçîrvan bi destan çêlîkên kewan digirtin. Çêlkewên ku hîna perên wan mezin nebûbûn û nedikarîn bifirin. Çêlkew dianîn malê, ew bi hêk, nan û kuliyan xwedî dikirin. Çêlkew di rekihan de mezin dibûn û dibûn kewên kedî. Bi wan kewên kedîkirî, nêçîrvan diçûne nêçîra kewên li serê çiyayan. Kewên kûvî, bi kewên kedîkirî dixapandin. Ew kewên ku li serê çiyayan, li nav lat û zinaran, azad difirîn, dê ji kû derê bizanibin ku kewên ji wan, dê bibin neyarên wan. Dê defk û xefkan li ber wan deynin û wan bidin girtin û kuştin.

Loma her tim di xeyala min de bû ku rojekê ez biçim çiya, nik wan. Binasim cîhana wan. Bibînim jiyan û azadiya wan. Û bêtir ji wan re yek bi yek bibêjim xetere û xerabiyên mirovan.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Û rojekê, ew xeyala min, bû rastîn. Demsala biharê bû. Rojekê berê, baran barîbû. Wisa ku baranê, ax û kevir, dar û devî, çiya û banî; bi yek carê xweza şuştibû.. Bêhna axa şil, di laşê mirovî de digeriya. Pelên darên berû bi her awayê rengê kesk xemilîbûn. Pel darên berûyî, darên berûyî jî xweza geş kiribûn.

Meta min Sosinê, gazî min kir:

– Kato, zû were! Em ê biçin çiyê, kuvarokan berhev bikin. Piştî baranê ku tav derket, kuvarok serê xwe ji bin axê derdixin. Em ê îro têra şîva xwe kuvarokan bînin.

Ligel çend keçikên xama, tûrkên me di milê me de, nan û penêr di tûrikan de, me riya çiyê girt. Dilê min dikire kutekut. Peroşa ku canê min wergirtibû, bedena min dilerizand. Ji berhevkirina kuvarokan bêtir, ajalên ku min dixwest bibînim di hişê min de diçûn û dihatin.  Gelo îro, min ê kîjan ajal bidîtana.

Hevala meta min, Nefela keça apê Merdo digot:

“Bila her tim şivek di destê we de be. Bi şivê him hûn ê li nav deviyan, li kuvarokan bigerin, him jî ku marek derkete pêşiya we hûn ê xwe bi şivê ji mar biparêzin. Bi vê gotinê bedena min mîna qeşayê sar dibû û careke dî dilerizî.

Berçema keça cîranê me ku  ji hemû keçikên wê rojê mezintir bû û min jê re digot xaltiya Berçemê jî, çend caran li ser hev dûbare kiribû û ji min re gotibû, nayê bîra min. Hema ku çavên me li hev diketin, digot:

“Kato, berxikê xaltiya xwe, delingên şalê xwe, têxe nav goreyan. Ji bo mar bi hêsanî nikaribin bi te vedin. Û ji bîr meke, bila her tim çavên te vekirî û li derûdorê bin. Ku bihar hat û dinya germ bû; mar ji hêlînên xwe derdikevine derve.

Ma tenê mar, jîjo, kûsî, rovî, kîvroşk, quling, kund, eylo, baz, kew, kevok... Ev hemû di ber çavên min re diçûn û dihatin. Li ber çavên min, dîlana ajalan bû. Ji kêfa wan jî dilê min cihê dîlanê bû. Ez di pêşiya hemûyan de dimeşiyam. Bi qasî keçên xama, zarok jî hebûn. Hinan biraziyên xwe, hinan xwarziyên xwe, hinan jî xwişk û birayên xwe bi xwe re anîbûn.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Hîna em nû ji gund derketibûn. Li keviya rê me kusiyek dît. Gava em nêzîkî kusî bûn, tavilê serê xwe û piyên xwe kişande nav qalika xwe. Weke depekîereş bû. Keçên xama nesekinîn, ji me dûr ketibûn. Zarokan kusî berevajî qulibandin û dîsa bi riya xwe de dom kirin. Lê dilê min ranegirt ku ez kusî di wê rewşê de bihêlim. Tavilê ez vegeriyam, min kusî sererast kir, quliband ser piyan û bi bayê bezê gihiştim hevalên xwe.

Gava em gihiştin keçikan, tev li ser hev kom bûbûn. Li dora tiştekî bûbûne xelek. Bi meraq min xwe gihand nav wan. Marekî gewr, di nîvê xeleka keçikan de bû. Seranserê laşê mar birîndar kiribûn. Ji her cihê ku kevirek lê ketibû, xwîn diherikî. Hîna jî rih tê de hebû. Teriya wê çend caran lebitî.

Me marê mirî li wê derê hişt û ji nû ve ketin ser riya ku dê em bibirana nav deviyên ku kuvarok di binê wan de, li benda me hebûn. Hin zarok, piştî ku mar dîtibûn, bi şid dawa kirasê mezinên xwe girtibûn. Ji tirsa rûyê wan bûbû mîna zerka hêkê.

Ez qet netirsiyabûm lê kêfa min şikestibû. Mirov neyarê ajalan bûn. Kûsî, mar, kew, kevok çi biketa ber wan dikuştin. Ne wijdan hebû bi mirovan re, ne jî bi tiştekî dizanîn. Ku ne ji maran bûya, mişk tiştekî di nav zeviyan de nedihiştin. Mişk neyarê çandiniyê bûn û mar her tim mişk dixwarin. Maran, axê serobino dikirin. Ax dikolan, axê hewa distend. Lê çi fêde ku mirov jî mar dikuştin. Ligel ku tu xisara mar ji bo mirovan tune bû, ew jehra pê re, ji bo ku xwe ji xetereyan biparêze bû. Heta ku xwe di xetereyê de nedîtana, tu carê ew jehr bikar nedianî.

Dema kalê min ev agahî dabûne min, min jî gotibû:

– Kalo, madem wisa ye, çima mirov maran dikujin?

Kalê min jî bi xemgînî gotibû:

– Lawê min, ma kanî aqil! Ji bêaqiliya xwe dikujin.

Mamosteyê min ê pêşî, kalê min bû. Ji roja ku tê bîra min riha wî spî, mîna berfa li serê çiyayên me bû. Desmaleke sor li serê xwe dipêça. Li malê jî ew desmal tim li serê wî bû. Tenê gava ku


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

radiket, desmala xwe ji serê xwe dikir û datanî ber balgiha xwe. Bi sedan caran çîroka Mem û Zîn ji me re vegotibû. Lê carina bapîra min dihat, digot:

– Rabe here ji vir. Hiş bi te ve nemaye. Tu çîroka Mem û Zînê, kin dikî, li hin cihan jî tevîhev diki. Rabe, ez çîrokê ji zarokên xwe re xweşik û rast vebêjim.

Û me serê xwe datanî ser çoka bapîra xwe. Ji nû ve, ji serê pêşî dest bi vegotina çîroka Mem û Zinê dikir. Ew qasî pir ji me re vegotibû ku me gelek deverên çîrokê jiber kiribû. Di kû dera çîrokê de, em noqî nav xewa şîrîn dibûn, nizanim. Gava em şiyar dibûn, me xwe di nav nivînên xwe de didît. Lê bapîra min ew qasî xweş vedigot, me nedixwest em rakevin. Ji bo heta dawiyê em şiyar bimînin, me li ber xwe dida. Lê mixabin gelek caran bêyî ku em bigihin dawiya çîrokê, xewê zora me dibir û em bi xew ve diçûn. Ligel ku me ji serî heta bi dawî, çîrok jiber kiribû jî, di her vegotinê de, em li wê yekê dipan ku Mem azad bibe. Zîn û Mem bigihin hev. Û tenê Beko bimire.

Sala ku min pola pêncem qedand kalê min jiyana xwe ji dest da. Kalê min ê ku ez bi çîrok û vegotinên wî mezin bûbûm. Bi çîrok, mamikên xwe bûbû mamosteyê min. Ëdî ez duwazdeh salî bûm û min dibistana gund qedandibû. Wê salê ez û hin hevalên min ên di temenê min de, me dê dest bi dibistana li navçeyê, dibistana ku jê re digotin, “dibistana navîn” bikira. Piştî ku dibistana gund diqediya, hin kesan digot:

– Ji me nayê em zarokên xwe bişînin bajaran.

Tim di bîra min de bû, bavê min gotibû:

– Ku ez lihêfa li ser xwe jî bifiroşim, ez ê kurê xwe bişînim.

Kalê min jî, di her gavê de, digot:

– Lawê min, li dibistanê li mamosteyên xwe guhdarî bike û li pey dibistane here ha!

Bavê min, ez şiyandim û ez li dû dibistanê çûm. Ëdî nizanim, gelo bavê min lihêfa li ser xwe firotibû yan na.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Jixwe mamosteyê me jî, her tim digot:

– Xwendin rêyên nû vedike, bi rêya xwendinê hûn dikarin cîhana xwe, jiyana xwe biguherînin. Wisa hûn dibin ronahî di pêşiya derûdora xwe.

Dibistana navgîn, lîse, zanîngeh...

Ji niha ve, peroşek di canê min de digeriya. Ez diketme nav xeyalên bajarên dûr û mezin. Dibistanên mezin. Û dûre jî berê xeyalên min vedigeriyane roja pêşî ku li gund, me dest bi dibistanê kiribû. Ew roja destpêkê ku tu carê ji bîra min neçe.

Weke vê kêliyê di bîra min de ye. Tirseke mezin ketibû dilê min. Destê min dilerizîn. Ez matmayî bûm. Her tişt bi min biyanî dihat. Di her gavê de me xwe şaş dikir. Mamoste diaxivî lê min qet tiştekî fêm nedikir. Ne guhên bi kêrî tiştekî dihatin û ne jî zimanê min. Hişê min tevîhev bûbû, çavên min nedixwestin tiştekî bibînin.

Ne tenê ez, yek ji zarokên ku bi min re dest bi dibistanê kiribûn, ji axaftina mamosteyî tiştek fêm nedikirin. Bi tirs me li rûyê hev dinihêrî. Em mîna çêlkewên ku diya xwe winda kiribûn bûn. Zarokên mezin dikarîbûn bi mamoste re, bi tirkî biaxivîn. Ew fêrî zimanê mamoste bûbûn. Gava pirsên mamosteyî dibersivandin, bi serbilindî radibûne ser piyan û bi quretî diaxivîn. Carna jî mamoste tiştin digotin, zarokên ji me mezintir, ji nişkê ve bi gotinên mamosteyî dikenîn. Lê ji ber ku me tênedigihişt, em nedikenîn. Em ên piçûk, devê me vekirî, wisa em li wan dinihêrîn. Ligel tirsê, meraqa me jî zêde dibû.

Carekê jî, mamoste pirsek ji Memyan kiribû. Piştî bersiva Memyanî vê carê mamoste gelekî keniyabû. Keniyabû lê paşê jî bi xemgînî û hinekî bi qehr tiştin gotibûn. Lê ji ber ku me nû dest bi dibistanê kiribû û me bi tirkî nedizanî, dîsa wisa devê me vekirî, me guhdarî kiribû. Piştî ku em derketibûn derve, li hewşa dibistanê, em li ser serê Memyanî kom bûbûn. Me jê xwestibû ku mamoste çi jê pirsiye û wî jî çi bersiv daye mamosteyî, ji me re vebêje. Wî jî bi quretî ji me re vegot:


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

– Mamoste, ji min pirsî, got hûn çend xwişk û bira ne. Min jî got, em şeş in. Mamoste got, navê wan bibêje. Min got; Serdar, Memyan, Adar, Sefkan, Koberz û Cindî. Li ser vê mamoste ji min re got, ma tev kur in, qet keç nîn in? Min jî got; belê çar jî keçik hene. Mamoste got, tu çima wan jî najimêre? Min jî got; ew keçik in.

Lê em weke mamoste bi gotina Memyanî nekenîn û em tênegihiştin ku çima mamoste keniyaye. Piştî ku em fêrî axaftina bi tirkî bûbûn û êdî gotinên mamosteyî baş têdigihiştin; me fêhm kiribû ku mamoste dibêje, zarok zarok e; çi kur û çi keç. Mirov, mirov e; çi jin û çi jî mêr. Yek ji yê dî ne bikêrtir û ne birûmetir e. Û çi jin, çi mêr; hemû mirov xwediyê heman mafî ne. Divê keçik jî ji îro û pê ve biçin dibistanên li bajaran, ev mafê wan e jî. Gava min ev gotinên ku mamoste li dibistanê ji me re gotibû, li nik dê û bavê xwe got, berî bavê min, diya min got: – De were û li vê ecêbê binihêre. Keçik rabin biçin bajaran, bajarên dûr.

Min bi baldarî li mamosteyî dinihêrî. Gava ku me ji axaftina wî fêm nedikir, gava ku em li hember gotin û pirsên wî bê deng diman; gelekî aciz dibû, ne tenê aciz dibû, ew pir xemgîn dibû. Min rojekê, ev yek ji kalê xwe re got:

– Kalo çima em ji axaftina mamosteyê xwe tênagihêjin?

Kalo yekser digot:

– Hûn hê piçûk in kurê min, kengî hûn mezin bûn, hûn ê fêrî tirkî bibin.

Ev bersiv têrî min nedikir. Vê carê, min berê pirsa xwe diguhert:

– Çima mamoste nizane weke me biaxive?

Kalê min pêşî difikirî, dûre bi ken digot:

– Ew hîna piçûk e, kurê min. Bi kurdî nizane.

Kalê min tu pirseke min bê bersiv nedihişt. Ew ji kalekî bêtir, bavê min bû, mamosteyê min jî bû. Ku bavê min çend rojan li


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ser hev nedihate malê, min qet ji diya xwe nedipirsî lê ku şevekê kalê min dereng dima, ez dîn û har dibûm. Min bi kirasê diya xwe digirt û dikişkişand. Min digot:

– Dayê, kanî kalê min?

Rojekê min ji kalê xwe pirsî, min got:

– Kalo tu jî çûyî dibistanê?

Kalo got:

– Na, ez neçûm.

Pirsa kalê min, ecêb bû. Ji hêlekê ve, her roj ji min re digot, bixwîne, dibistana xwe bidomîne; ji hêla dî ve, dibêje ez neçûm dibistanê. Bi vê matmayînê, ez dîsa dipirsim:

– Çima tu neçûyî kalo?

Li ser pirsa min î şaşwaz, kalê min cihê xwe xweş dike:

– Dema ez piçûk bûm, di gundê me de dibistan tune bû. Ma tenê dibistan, rêya me jî tune bû. Tirimbêl nedihatin gund. Ji xwe hingê, weke niha tirimbêl jî ne pir bûn. çûn û hatina navçeyê û bajaran pir zehmet bû kurê min. Ma weke îro bû, îro carinan di rojekê de bîst tirimbêl tên û diçin. Tirimbêlên gundiyên me hene.

– Nexwe, tu çawa fêrî tirkî bûyî kalo?

– Ez li leşkeriyê fêr bûm, bavê kalê xwe. Min çar salan leşekerî kir. Li wir, li bajarê Konyayê, em fêrî tirkî û hinekî jî em fêrî xwendin û nivîsandinê bûn.

Piştî fikirîneke dirêj, bêhneke kûr kişand û ji min pirsî:

– Kato, kurê min, ez ê tiştekî ji te bipirsim lê divê tu netirsî, rast bibersivînî ha.

Dîsa bi şaşwazî min lê nihêrîbû, çima ez ê bitirsiyama, çima min ê derew bikirana? Li çavên min nihêrî:

– Li dibistanê, mamoste qet li we dixe?

Ez ji hemû caran bêtir matmayî bûm. min mamoste Necmî û mamoste Nazan anî ber çavên xwe, ez fikirîm, min tu wate nedida


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

gotin û ramanên kalê xwe. Dê çawa ev mirovên qenc ku her gav ji bo me dixebitin, hez ji me dikin, bi me re dikenin û dileyizin, lêdanê li me xin? Qet tênedigihiştim, bi wê şaşwaziyê min ji kalê xwe re got:

– Bo çi li me xwe kalo?

– Bo ku hûn têнagihêjin, bo ku hûn bi tirkî nizanin.

– Na kalo, mamoste tu carê ji bo tiştekî li me naxwe. Ku em fêhm nakin, ku em nikarin bersivan bidin; pir caran xemgîn dibe lê lêdan qet na.

Vê carê kalê min  matmayî bû:

– Lawê min, ez neçûm dibistanê lê di dibistana leşekeriyê de, me gelekî lêdan xwar. Her roja xwedê, bi daran li destên me didan. Her roj destên me, bi lêdana daran sor dikirin. Hemû paqijî û karên giran bi me didan kirin.  Min gelek êş kişand. Piştî ku li gund dibistan çêkirin, bavê te, apê te, xalên te tev çûn dibistanê. Axaftina bi kurdî qedexe kirin. Kesên sîxûr dişiyandin nav gund. Sîxûr, ji pişt derî û dîwaran li axaftina nav malê guhdarî dikirin. Kesên ku bi kurdî diaxivîn, dihatin cezakirin. Bi qasî peyvên ku axivîbûn pere distandin ji wan.

Matmayîna min her diçû zêde dibû, min bi baldarî li vegotina kalê xwe guhdarî dikir.

– Paşê cezayê pere rakirin lê kesên ku bi kurdî diaxivîn lêdan dixwarin. Kesî ji tirsa nediwêrî bi kurdî bi dayika xwe re jî biaxiviya. Û di gund de, yek pîrek jî bi tirkî nedizanî.

Wê gavê bavê min jî li cem me bû. Li min û kalê min guhdarî dikir. Piştî kalê min, vê carê wî dest bi vegotina serpêhatiyên dema dibistanê kir:

– Ew roja yekem, roja ku me dest bi dibistanê kir, qet ji bîra min naçe.

Bavê min, hinekî rawestiya, bêhneke kûr kişand. Awirên wî çûne dûr. Mîna ku dengê wî ji nav wan rojên dûr dihat:

– Roja yekem bû. Di wê kêliya ku em gihiştibûn hewşa dibistanê, mamoste em li nik hev kiribûne rêz. Berê me tevan li


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

mamosteyî bû. Ez di rex kekê xwe Şero de bûm. Mamoste, bi zirt tiştek got. Min tu tişt fêm nekir. Her yek bi dorê tiştek digot. Dor hate kekê Şero. Heta ez sax im, ji bîra min naçe. Kekê Şero, her du destên xwe bi laşê xwe ve zeliqandin û heta jê hat, bi dengekî berze got,

'On bêşşşş'.

Ez li dû kekê Şero bûm. Min dizanîbû êdî dor, dora min e. Û diviyabû ez tiştekî bibêjim. Lingê min weke pelê çilo dilerizîn. Peroşekê canê min wergirtibû, te digot qey agir ketiye bedena min. Min jî mîna kek xwe Şero, heta Xwedê hêz da min, min dengê xwe bilind kir û min jî got,

'On bêşşş'.

Min digot, baş e, dor ji ser min çû. Hîna ez di nav wê kêfê de bûm, tiştekî ku şerq û li nîvê serê min ket. Tavilê min destê xwe bire serê xwe, min li cihê ku baqa mifteyên mamoste lê ketibûn, danî.

Bavê min li vê derê hinekî rawestiya, dîsa bêhneke kûr ji gava dî kûrtir kişand û vegotina xwe domand:

– Heta em birin hundirê polê, li ser kursiyên dirêj rûnandin jî, destê min li ser serê min bû. birûsk ji cihê ku mifte lê ketibûn diçûn. Destê min wisa qerimîbû. Ku min destê xwe, ji ser serê xwe danî ser maseya li ber min, min dît ku mista min tije xwîn bûye. Li ser maseyê, wêneya destê min ji xwînê çêbûbû. Gava hevalê li nik min xwîn li ser maseyê dît, qêrînî pê ket, got:

"Dayê xwîîînn!"

– Bi qêrîna hevalê min re, min jî dest bi girî kiribû...

Kalê min û bavê min, her du jî li nav çavên min dinihêrîn, mîna ku dîsa ji min dipirsîn.

– Na kalo, na bavo na! Mamosteyê me pir baş e. Her tim bi me re dileyize, dikene. Ku em tênagihêjin, bi destan, bi wêne û fotografan rê me dide û dihêle ku em têbigihêjin û fêr bibin. Û her tim dibêje, 'Ez jî dixwazim, fêrî kurdî bibim,"


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

* * *

Piştî vebûna dibistanê bi du mehan bû. Meha dawî ya payîzî bû. Bi şev gelekî baran barîbû. Gava em ji xwê şiyar bûn, me dît ku bexçeyên gund tev di bin avê de mane. Binya gund bûbû mîna golekê. Di rojên wisa de ku bestê têrî ava barana ku ji nişkê ve barîbû nedikir, gundî ji kêfa dikirin dîlan. Ava xurt, êzingên hişk ên li binê dar û latan, tev berhev dikirin û bi xwe re dianîn. Jin û mêr, zend û bendên xwe diçikandin, diçûne qiraxa avê. Bi darên dirêj û çiqulî, êzingên ku di ber avê re dihatin, ji nav ava sorî çoravî derdixistin. Ku salê du caran wisa bibûya, her mal têra zivistana xwe êzing berhev dikirin. Gundî ji çûna çiyê û anîna êzingan, li ser pişta keran xelas dibûn.

Wê sibehê, ez jî çawa ku min çavên xwe bal kirin, bezî me ber derî. Besta me ne best bû êdî, bûbû derya. Deryayeke sor. Weke her carê, gundî tev li binya pirê bûn. Tavilê min pêlav kirin piyê xwe û bi bayê bezê gihame nik wan. Ne tenê mezinên gund, çi qas zarok hebûn li gundê me ew jî hatibûne vê derê. Lê vê carê tiştekî awerte hebû. Yek kesî êzing ji nav avê dernedixist, ligel ku êzing li qiraxa avê, li vî alî û li wî aliyî wer dibûn,  ligel ku êzing gelekî nêzîk bûn û kişandina wan pir hêsanî bû.

Jin li ber dikana apê Cindî kom bûbûn, bê rawest digiriyan. Dikana apê Cindî girtî bû. Zilam, şivên dirêj di destê wan de, di ber bestê re diçûn û dihatin. Peyvek ji devê kesî dernediket. Zarok jî mîna mezinan destê xwe xistibûne tihêla xwe û li tevgerên mezinan temaşe dikirin. Ez nêzî, koma zarokan bûm. Kekê min Dorşîn û hevalê wî Gebar jî li wir bûn. Min bi dizîka ji kekê xwe pirsî:

– Kekê Dorşîn, çima Pîrek digrîn?

Kekê Dorşîn jî mîna zilaman, li dûr dinihêrî, wî qet berê xwe neda min û pirsa min nebersivand. Lê min dev jê berneda:

– Kekê Dorşîn, zilam li çi digerin? Tu çima bersiv nadî min?

Mixabin, ne pirsên min ên meraqdar, ne jî nêrînên min ên lavekar, tu bandor li Kekê Dorşîn nekirin û devê wî venebû. Min jî berê xwe da koma zarokan. Di nav koma zarokan de, çavê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

min li Arjînê kurê xalê Merdan ket; hêstir ji çavên wî diherikîn, bi giriyekî bêdeng, hûr hûr digirî. Hemû zarok li dora wî kom bûbûn. Arjîn jî mîna min, îsal dest bi dibistanê kiribû. Selîm nêzî min bû. Selîmê ku kes pê re nedileyizî, Selîmê ku her kes jê re digot, Selîmê pozlîçik. Ew seranserê rojê, di nav gund de digeriya. Bexçeyek, zeviyek nedima ku nediçûyê. Min ê ji wî bipirsiya, teqez wî her tiştî dizanî. Berî ku ez xwe nêzîkî wî bikim û bipirsim, gelo li gundê me çi qewimiye, çima Arjîn digirî. Jin çima digrîn, zilam li çi digerin? Mîna ku min gazî wî kiribe, tavilê hate nik min. Devê xwe kire guhê min, bi dengekî nizm û tije tirs û ew qas jî xemgîn:

– Dibêjin bavê Arjîn, xalê Merdan di ber avê de çûye. Ma tu nabînî, zilam tev lê digerin. Niha dê cendirme jî werin. Gebar wisa got.

Xalê Merdan, zilamekî bejindirêj bû, ciwan bû. Du zarokên wî hebûn. Arjîn ê mezin bû. Argeş jî yê piçûk bû. Navê diya wan jî Xezal bû. Roja me dest bi dibistanê kir, xalê Merdan ji min pirsîbû, “Kato, şêro tu dixwazî bibî çi?” Ji şerman, ez bêdeng mabûm û min serê xwe, li ber xwe tewandibû. Kalê min, bi hewara min ve gihabû û gotibû, “Kurê min dê bibe yekî mezin.” Lê yekî mezin çi bû, çawa bû; ne wê rojê, ne jî îro, tênegihiştim.

Wê rojê heta tarî kete erdê, cendirme û zilamên gundê me di ber bestê re çûn û hatin. Bi şivên dipîdirêj, binê lat û darên di nav avê de seh kirin. Heta bû êvar, zarok û jin jî, ji cihê xwe neliviyan, li wan temaşe kirin. Mamosteyê me jî li cem me bû, wê rojê tu kes neçû dibistanê. Mamoste qet ji cem me nelivî. Geh koma zarokan ji qiraxê ava bestê ku îro dîn û har bûbû, bi dûr dixist, geh diçû nik Arjîn, ew bişid hembêz dikir, porê wî mist dida.

Dotira rojê jî em neçûne dibistanê. Nîvro bû, me dît ku girseya zilaman, ligel cendirmeyan ji hêla jêr ber bi me ve tê. Her kes bezî pêşiya wan. Cendekê xalê Merdan, li ser darên dirêj, li milê xwe kiribûn. Betaniyeke reş pê dakiribûn, ne destên wî, ne rûyê wî xuya nedikirin. Bi hatina cendeirme û zilaman re, qêrîn bi pîrekan ket. Diya wî, xwehên wî, jina wî, bi her du destan li xwe dixistin.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Porê xwe kur dikirin. Xwe li erdê dixistin. Hemû pîrekên gund bi wan re digiriyan.

Min di nav koma zarokan de, çavên xwe li Merdan gerandin. Ne di nav zarokan de bû. Li pey zilaman, mamoste Necmî bi destê wî girtibû, cîranê wan apê Sêvo jî bi destê birayê wî Argej girtibû, hêdî hêdî li pey girseyê dimeşiyan. Her du jî digirîn. Dilê min bi wan şewitî, tavilê hêstirên çavên min, xwe berdane xwarê. Min li kêleka xwe nihêrî, Selîm li nik min bû. Selîm jî digirî, hêstirên wî diherikîn, weke her carê pozê xwe dikişand.

Roja piştî wê, mamoste gazî me tevan kir. Em li pey hev bûne rêz. Mamoste li pêşiya me, em çûne, mala Arjîn. Hemû gundî li wê derê bûn. Hin kesên ji gundên cîran jî hatibûn.

Bi banga meta Sosinê re, ez ji serpêhatiyên salên pêşî yên dibistanê şiyar bûm. Serpêhatiyên salên pêşî yên dibistanê ku tu carî ji bîra min nediçûn û bawer nakim ku tu carê jî biçin. Meta min bi dengekî bilind û bi xeyd gazî dikir:

– Kato, Kato... Tu li kû mayî lo!?

Gava ez gihiştim cem meta xwe, destê xwe di stûkra min re bir:

– Berxê meta xwe, rihê meta xwe, hinekî bilezîne da ku em ji hevalan nemînin. Divê em îro tûrika xwe tije kuvarok bikin. Ën malê, li hêviya me û şîvê ne.

Em wê rojê heta piştî nîvro li çiyê geriyan. Me yek devî, yek lat bernedida. Bi şivên di destê xwe de, me her tilmika piçûk ku derdikete pêşiya me dixepirand. Me serê jivê, bi hêdîka, li tilma axa ku hinekî bilind bûbû dixist. Diviyabû kuvaroka di bin tilmika axê de ye, neşike. Heke serê kuvarokê, di cihê ku me bi serê şivê dikola derketana, em gelekî bi kêf dibûn. Hingê, me serê şivê dixiste binê kuvarokê, weke kulîlka bilbizêkê me derdixist.

Wê rojê ne tenê tûrikek, me du desmal jî tije kuvarok kirin. Malbat wê şevê têr kuvarok xwar. Diya min kuvarok di nav rûnê malê de, bi pîvaz û ava bacanan sor kirin, dûre hinek av berda serê. Bû mîna tirşikê. Bavê min digot:


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

– Bi sê qesem navê Xwedê, ev kuvarok ji goştê berxan jî xweştir in.

Xaltîka Peyrûza cîrana me bû. Bi tena serê xwe dijiya, bêkes bû. Her roj, cîranan şîv dibirin jê re. Êvarên roja înê, gelek kes şîv ji xaltiya peyrûza re dianîn. Îşev, ne êvara înê bû lê şîva me şîveke taybet bû û her carê peyda nedibû. Tenê di biharê de kuvarok derdiketin. Diya min zerikeke mezin tije kir û da destê min. Min ji xaltîka Peyrûza re bir. Piştî gelek diayên ku ji min re kirin, pirsî:

– Kato, kurê min, te ev kuvarok ji çiyê anîne?

Bi sserbilindî min bersiv da:

– Erê xaltîka Peyrûza, min û meta xwe Sosinê.

– Xwedê xêra we binivîsîne, dest û piyên we ter bin her tim.

Min jî got:

– Noşîcan be xaltika Peyrûza.

Xaltîka Peyrûza pîrebî bû. Min mêrê wê nedît qet. Ji roja ku tê bîra min, ew bi tena serê xwe dijî. Bi xêr û alîkariyên cîran û gundiyan debara xwe dike. Piştî ku ez ji mala xaltîka Peyrûza hatim, min ji diya xwe pirsî:

– Dayê, mêrê xaltîka peyrûza kengî mir?

– Beriya tu werê dinyayê, zêdeyî deh salan berî niha.

– Ew çawa mir?

– Bi karwanê qaçaxçiyan re diçû binxetê. Wê carê kavir dibirin. Di navbera her du têlên xetê de, di navbera qaçaxçî û leşkerên xetê de şer derdikeve. Kavirên wan, di nav mayinan de belawela dibin. Gava dixwaze kaviran vegerîne û li ser hev bicivîne, pê li mayinê dike. Laşê wî perçe perçe dibe.

– Qet zarokên wê nîn in?

– Belê, kurekî wê heye. Yekî belengaz e. Li gundekî deştê şivantiyê dike, bi zorê debara xwe dike. Kêm caran tê, seriyekî li diya xwe dixe.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Di rojên roşanan de, di serê salê de, serê sibê ez diçûme nik xaltiya peyrûza. Min destê wê maç dikir. Ez li nik wê rûdiniştim. Her tim ku çavên wê bi min diketin, digot:

– Were kurê min, were.

Û diçû ji nav kîs û bexçikan, şekir, behîv, benîşt û her weha tiştên wisa didane min.

* * *

Heta dawiya meha biharê, her roja betlaneyê ku dibistan girtî bû, ez bi meta xwe re diçûme  çiyê, berhevkirina kuvarokan. Li çiyê em rastî gelek ajalan dihatin.

Mar, ji nişkê ve, digo xwiişş û di ber me re, di nav giyayê ku bi qasî bostekê mezin bûbû, diherikî binê kevir û latan û winda dibû. Kûsî, di nav deviyên berû, ku pêjna me dikir, serî û lingên xwe dikişandine nav qalika xwe, mîna kevirekî reş ji cihê xwe nediliviya. Maşot, kom bi kom xwe li giyayî şîn digirtin, bi her hewldanekê, laşê wan bi carekê dilerizî, mirov digot qey dîlana wan e û li ber def û zirneyê dileyizin. Quling, ref bi ref, perên xwe li bayê hênik dixistin, xwe li kortên ku bi ava baranê bûne gol digirtin. Eylo, li bilindehiyên asîmanan, weke tîreke reş bi giranî digeriyan û hebûn û tevgerên li ser erdê bi hostayî raçav dikirin. Tîtî pepûk, qijik; ji wê darê diçûne dara dî, ji ser latekî difirîne ser lateke dî, her yek bi reng û dengê xwe, digotin, va ye, em jî li vir in.Kîvroşkên ku bi tevgereke bişid û ew wasî bitirs, ji nav devî û binê latan radibûn û xwe li kaşên çiyê didan, bi qasî tirsa xwe, tirs dikirin dilê me jî...

Tenê ji ajalên ku min gelekî meraq dikir û min nedîtibû, hirç mabû. Min digot, xwezî hema çêlîkek be jî em rojekê li hirçê rast bên.

Di wan şevê zivistanê yên dirêj de ku mirov li malekê kom dibûn û serpêhatiyên ajalan dikirin. Bêtir jî yên hirçan. Ne tenê gundî, her weha mamosteyê me jî di dersê de agahiyên derbarê ajalan de dida me. Bi agahiyên mamosteyî, meraqa min a derbarê ajalên kuvî  de bêtir zêde dibû.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

* * *

Mamosteyê me ji bajarên dûr bû. Bi zimanê me nedizanî. Piştî mirina kalê min, ne tenê mamosteyê min ê dibistanê, her weha mamosteyê min ê jiyanê jî ew bû. Rojên betlaneyê jî ez diçûme dibistanê. Ez û keça wî Gulşah, heta êvarî em bi hev re dileyistin. Keça wî ji min piçûktir bû lê em di heman polê de bûn. Gava me dest bi dibistanê, bi pola yekem kir, Gulşah

nedihat dibistanê. Ji ber ku temenê wê  piçûk bû, mamoste digot, ew dê sala bê dest bi dibistanê bike.

Lê rojekê me dît, ji nişkê ve mamoste çû mala xwe ya ku bi avahiya dibistanê ve bû. Piştî çend deqeyan, me dît ku wa ye bi destê keça xwe girtiye û kete hundirê polê. Gulşah bir, li nik Selîm rûnand. Selîmê ku me navê wî kiribû, Selîmê pozlîçik. Û ev yek li nava gund belav bû, bi rojan li malan bû mijara axaftina jin û mêran.

Pozê Selîm mîna bêrma gundê me bê navber diherikî. Serê kêliyekê geh pozê xwe dikişand, geh bi zenda xwe paqij dikir. Loma zenda pêşmal û qutika wî dibû mîna depeke  hişk û di tava rojê de mîna camê diberiqî. Serê pozê wî tim kul bû. Ji ber vê yekê, tu kes nedixwest li cem Selîm rûnê. Mamoste kê li cem wî rûdinand, yan ji cem wî direviya yan jî dest bi girî dikir. Wê rojê jî, pêşî Serhatê kurê meta min, paşê jî Gulistana keça xalê min, ligel ku mamoste xwestibû li cem Selîm rûnin, ew pê qayil nebûbûn û bi girî, ji nik Selîm reviyabûn. Dûre hate ber maseya min, devê xwe kire guhê min û pistepist ji min re got:

– Kato, ku tu jî bixwazî, ez dixwazim tu li cem Selîm rûnî.

Li nav çavên min nihêrîbû û li benda bersiva min mabû. Lê qet bersivek ji devê min derneket. Hêstir ji çavên min herikîn ser rûyê min. Min serê xwe kire nav her du çengên xwe û hûr hûr girîm. Mamoste bêçare ma û ji cem min bi dûr ket.

Paşê em têgihiştibûn, ji ber ku Selîm bi tena serê xwe nemîne û dilê xwe bi xwe neşewitîne, keça xwe anîbû cem wî. Ev yek ji bo min bûbû sedema şermê. Min tu carê ev jibîr nekir.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Mamoste Necmî him bi gotinên xwe, him bi kirinên xwe bûbû hezkiriyê hemû gundiyan. Wî gelek tişt fêrî me dikirin. Digot:

– Li nava gund, li dora zeviyan, bostek cihê vala nehêlin. Li her derê daran deynin. Heta ji we bê, darên fêkiyan deynin. Gundê xwe, derûdora xwe, bi daran bixemilînin. Bi dar û kulîlkên ku li hewşa dibistanê û li dora dibistanî danîbûn, bûbû mastere ji gundiyan re. Wî ji navçeyê, ji bajêr gelek dar anîn li hewşa dibistanê danîn. Dora dibistanê jî bi daran xemiland. Rojekê di waneyê de, ji me re got:

– Zarokino îro ez ê we fêrî tiştekî nû bikim.

Hemû zarok, bi baldarî, me berê xwe dayê. Ji ber ku Mamoste Necmî em fêrî gelek tiştan kiribû, êdî em ji fêrbûnê têr nedibûn.

– Tişta ku ez ê we fêr bikim, bav û kalên we pê dizanin, lê tişta ku dixwazim bikim hîna tu kesî nekiriye.

Her diçû meraqa me zêde dibû, bi çavên birçî me li mamosteyê xwe guhdarî dikir.

– Belê zarokino. Weke ku we gelek caran ji bav û kalên xwe jî dîtiye, em dikarin hin darên fêkiyan bitehimînin. Weke mînak, tûyên ku tûyan nagirin an ku digirin lê ne xweş in; em wan bi tûyên xweş ditehimînin. Êdî ew tû mîna yê ku me pê tehimandine tûyên xweş digire. Tirî jî wisa dibe. Heta ku em dikarin darên tûyan bi xox û alûceyan jî bitehimînin. Mişmişan, zeytûnan bitehimînin.

Geh me li devê mamoste dinihêrî geh di bin çavan re me li hev dinihêrî. Tiştên ku vedigotin, me dizanî, heta ku gelek caran min dîtibû, kalê min darên fêkî tehimandibûn û bavê min jî fêrî dartehmandinê kiribû. Êdî sebra me nemabû, me dixwest zûka mamoste, ya dilê xwe ji me re bêje. Ji nişkê ve destê xwe yî rastê avête berîka sakoyê xwe, kulmek kizwan derxistin:

– Ev çi ye zarokino?

Weke min hemû heval bê kêf bûn. Mîna ku her kesî digot, “Wey li min ê, ev bû ya ku dê mamoste fêrî me bike!” Li dû wê tevgerê, me dît ku destê xwe yî çepê kire berîka dî û tavilê kulmek


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

fisteq derxistin. Fisteqên kum e di dikanan de didîtin û çavên me di wan  de diman.Dîsa bi heman awayî ji me pirsî:

– De zarokno bibêjin, vê carê ev çi ye?

Hemû zarokên di polê de, bi yek dengî, me bersiv da:

– Fisteqqqq....

– Ha de aniha bala xwe bidin min, çawa bav û kalên we darên tûyê ditehimînin û piştî tehimandinê, darên tûyê êdî xoxa digirin, ji îro û pê ve jî, dê şaxên darên kizwanê tije fisteq bibin. Dê darên kizwanê yên li nav lat û zinaran, bi weşiyên fisteqan tije bibin.

Bi yek carê rûyê me tevan geş û xweş bûbû. Ji niha ve mîna ku berîkên me tije fisteq bûn û ma ha ha dixwar, em bikêf bûn. Mamoste Necmî, berî rojekê çûbû navçeyê, ji wê derê  ji bo tehimandinê şivên fisteqan anîbûn. Hemû xwendekarên dibistanê bi yek carê, ligel Mamoste Nazan jî em çûne nav bexçeyan. Mûxtarê gund, apê Cemşîd jî hatibû. Piraniya zilamên gund hatibûn. Hinek jin jî li wê derê, bi nêrînên meraqdar li tevgerên zilaman dinihêrîn.

Gernasê bavê hevalê me Çiya, bi kêra di destê xwe de şaxeke kizwanê, di nîvî re birî. Dûre serê şaxa jêkirî, bi kêrê qelaşt kire du perçe. Paşê serê şiva fisteqê ya ku Mamoste Necmî ji navçeyê anîbû, mîna pênûsê pehn û tenik kir û xiste nav qelşa şaxa kizwanê. Pêşî bi heriyê seyand, paşê bi paçekî, piştî wê jî bi perçeyek naylonî pêçan û bi benekî girê da.

Wê rojê û rojên dûre, bi dehan, bi sedan darên kizwanê bi fisteqan hatin tehimandin. Piştî sê çar salan êdî fisteqên herî xweş ên wê herêmê, yên gundê me bûn. Di bazar û dikanên bajaran de dihatin firotin.

Di şevên zivistanê de, li her malê, gava navika fisteqan zikê me, kaşûlên wan jî sobeya êzingan germ dikirin, mirovan digot:

– Mala Mamoste Necmî hezar carî ava be ku fisteq anîn gundê me.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Piştî çar salan Mamoste Necmî ji gundê me çû. Ji bajarekî li ber deryayê bû. Û min jê re gotibû ku heke tu ji vir biçî, ez nema têm dibistanê. Ez ji pola çarem derbasî pola pêncem bûbûm. Wî j imin re got:

– Ez diçim bajarê xwe. Nik xwişk û birayên xwe. Ez diçim lê dê mamosteyine dî bên gundê we. Ew jî dê hez ji we bikin. Divê tu wisa nefikirî û tu carê, dev ji dibistanê bernedî.

Lê min nêrînên xwe berî erdê dan û min lingê xwe li erdê xistin. Pêre pêre jî hêstirên çavên min yeko yeko herikîn. Ji nişkê ve, ez ji cem wî reviyam. Heta roja ku mala wî bar kirin û dê bi rê keta, çavê min lê neket. Çi qasî pirsa min kiribû, zarok şiyandibûn pey min, lê heta wê roja ku xatir ji hemû gundiyan xwest û êdî dê tevî hevsera xwe, keça wan Gulşah, kurê wan Memed, li kamyonê siwar bûbûwana û biçûwana, min nexwest ez mamosteyên xwe bibînim.

Wê roja veqetînê, ji mezin û piçûkan re gotibû:

– Ji ber ku ez ji vê derê diçim, Kato ji min xeyidiye. Heta hûn neçin wî neyînin, ez bi rê nakevim.

Bi vî awayî kekê min Dorşîn û kurê cîranê me Gebar, hatin mala me. Min xwe li malika nivînan, li pişt lihêfan veşart. Kekê min Dorşîn, rasterast hat, perdeya ber malika nivînan vekir. Lihêfa di serî de rakir. Min xwe di bin lihêfê de kiribû gulok. Her du bi çengên min girtin. Ez birim cem Mamoste Necmî. Mamosteyê min, serê min kire nav her du destên xwe, her du hinarikên min li ser hev çend caran maç kirin. Paşê destê xwe danî ser serê min. Porê min miz da. Soz da min, got:

– Tu zanî, ku ez ji vir çûm, ez ê ji xwe re tirimbêlekê bikirim. Ez bi te re soz didim ku gava min tirimbêl kirî, ez ê werim gundê we. Ez ê çend rojan bibim mêvanê we.

Ew diaxivî. Min qet dengê xwe nedikir. Tenê xweş tê bîra min ku min li nav çavên wî nenihêrî û min tu tişt negot. Piştî ku Mamoste Necmî çû, mîna ku bavê Selîm miribû û sêwî mabû. Heta Mamoste necmî li gund bû, Selîm weke dîkekî serbilind li


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

nav zarokan digeriya. Kesî newiribû tiştekî jê re bibêje. Lê piştî çûna Mamoste Necmî, ew rûyê kenok çûbû, rûyekî mîna rûyê nehtorê dadgehê lê peyda bûbû. Bi kesî re nediaxivî. Bi kesî re nedikenî. Min gelek caran dixwest pê re biaxivim. Bi min wisa dihat ku ez qenciyê bi Selîm nekim, ez ê li hember Mamoste Necmî bêrêziyê bikim. Lê her tişt bê sûde bû. Çûna Mamoste Necmî, Selîm guhertibû ew bûbû yekî dî. Ew Selîmê berê çûbû, yekî dî hatibû şûna wî.

Sê salên mîna sî salan di pey çûna Mamoste Necmî re derbas bûn. Li gundê me gelekî guherîn pêk hatin. Du mamosteyên dî hatin şûna wan. Li kêleka gundê me bendav hate çêkirin. Neqeba ku dema şape radibû û gundî tev diçûne temaşekirina kêferata avê û êzingên ku avê bi xwe re dianî berhev dikirin, bi dîwarekî stûr û bilind girtin. Pişt dîwêr bû mîna gola Wanê. Bexçe û zeviyên gundê me di binê avê de man.  Ew darên kizwanan ku her sal bi kîsan fisteq digirtin, ji ber ku dê li binê avê bimana hatin birîn.

Gava hate gotin ku dê li gundê me, li neqeba ku best teng dibû, bendavê çêkin, Mamoste Necmî zehf xemgîn bûbû. Ji gundiyan xwestibû ku bi her awayî li hember çêkirina bendavê derkevin. Wî qet nedixwest bendav li gundê me çêbibe. Heta roja çû jî her gavê digot:

– Ku bendav çêbibe, dê xwezaya gund ya hezar salan bi yek carê biguhere. Ji ajalan bigire, heta bi riwekan dê her tişt biguhere. Dê zevî li binê avê bimînin. Dê darên ku bi salan mezin bûne û hatine vê rojê, tev bêne birîn. Piştî çend salan, dê cihê ku av lê kom dibe, tije axa mîna xweliyê bibe. Dê bibe çorav ku bi kêrî tu tiştî neyê. Hingê dê bendav jî bêwate bimîne. Temenê bendavan pir kurt e lê temenê gerdûnê dirêj e. Bi çêkirina her bendavekê, em jiyan û cîhana zindiyan teng dikin.

Di vî warî de gundî bi ya mamoste dikirin. Wî çi rê nîşanî wan dida, dikirin. Carekê Mamoste Necmî, Mamoste Nazan jî tê de, jin û mêrên gund, peya ketibûne ser riya navçeyê. Dê bi meşê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

biçûyana heta devê deriyê qeymeqamî. Min jî xwestibû bi wan re biçim lê Mamoste Necmî nehiştibû, gotibû:

– Ev ne karê we ye. Ev kar, karê mezinan e. Hûn biçin bileyizin.

Wê rojê, leşkerên qereqola gundê Sarê riya gundiyan birîbûn û nehiştibin biçin navçeyê. Li ser vê yekê, vê carî jî bi pêşengiya mamosteyên me ji bo ku bendav neyê çêkirin, di dadgehê de doz vekirin. Lê mixabin, dadgehê daxwaza gundiyan nepejirand û dawiya dawî ne bi dilê gundiyan be jî, bendav hate çêkirin.

Em zarok bi bendavê gelekî kêfxweş bûn. Piştî dîwarê bendavê, av her roj zêde dibû. Di navbera salek du salan de goleke mezin pêk hat. Hîna me aveke wisan mezin nedîtibû. Me şewk diavêtine nav avê, me masî digirtin. Hin gundiyên me ji xwe re kelek çêkiribûn. Xeratê gundê me, xalê Derbas êdî kelek jî çêdikirin. Hin kes debara xwe bi masiyan dikirin. Bi şev li kelekên xwe siwar dibûn, diçûn torên xwe diavêtin nav avê. Carina masiyên bi qasî karikan digirtin.

Di rojên havînî de, ji serê sibê heta ber êvarî, em ji nav ava bendavê dernediketin. Me berê avjenî nedizanî, lê gelek ji me fêrî avjeniyê bûn. Lê mezinên me tu carê bi bendavê kêfxweş nebûn. Gelek zeviyên me, darên me, di bin avê de mabûn. Heta bi riya gundê me guherî bû. Riya kevin di bin avê de mabû. Riyeke nû vekirin, lê riya nû ji ya kevin dirêjtir bû.

Ëdî bendav heta bi dev tije av bûbû. Gola avê, ber bi paş ve, heta bi quntarên çiyê fireh bûbû. Hemû newalên li dora gund tije av bûbûn. Rezên me yên li dora gund bi piranî di binê avê de mabûn.

Wê havînê bûyereke pir nexweş qewimî li gundê me. Bûyereke ku heta roja mirinê jî ji bîra min neçe. Hemû şêniyên gund, bi rojan, bi mehan di bin bandora vê bûyerê de man. Hê jî li gundê me şahiyek, dawetek li dar nakeve.

Di germa nava rojê de, komek zarok weke her gavê em ketibûne ava bendavê. Yên ku fêrî avjeniyê bûbûn, ji qiraxê dûr diketin û vedigeriyan. Me ev yek kiribû weke lîstikekê. Di nav avê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

de, em bi gokê jî dileyistin. Yên ku avjeniyê nizanîbûn, li qiraxê, carina xwe bi kevir û giyayên qiraxê digirtin, carina jî bi qasî çend metroyan kevir û giya berdidan û çeng û lingên xwe li avê dixistin, bêrawest dikirin şepeşep û di cî de vedigeriyan qiraxa ku jê dûr neketibûn. Hin jê lastîkên tekeran dianîn, di nav avê de xwe pê digirtin.

Ji nişkê ve, qêrînek bi zarokên ku avjenî nedizanîn ket. Tavilê yên ku me avjenî dizanî me xwe gihande qiraxê. Bi tirs me li ruyê hev dinihêrî. Zarokên li qiraxê dikirin qîreqîr, digotin:

– Selîmmmm, Selîmmmmm... Selîmmm...

Selîm, Selîmê ku min çi qasî li ber dabû ji bo ku fêrî avjeniyê bibe, lê tu carê fêr nebûbû, nedixuya. Ku em diketin avê, Selîm bi her du destên xwe, bi serê giyayekî şîn an bi kevirekî digirt û her du lingên xwe bêrawest, heta hêza wî hebû li avê dixist. Peşkên avê, wisa bi ser serê wî diketin ku kesî ew di nav kefa avê de, nedidît.

Bû barebara me. Em pir tirsiyabûn. Me kire hawar. Zilamên li zevî û bexçeyên nêzîkî me bûn, bi hawara me ve hatin.

– Kuro çi qewimî, çi bû?

– Zû bêjin, çi bi we hat?

Me hemûyan bi hev re, got:

– Selîmmmmm, Selîmmm... Kete nav avê û xuya nake.

– Binav bû û derneket!

Zilamên ku bi hawara me ve hatibûn xwe tazî kirin û xwe avêtin nav avê. Xwe binav dikirin, heta ku bêhna wan têrî dikir, li binya avê diman û serê xwe ji nav avê derdixistin. Çi cara ku zilamekî serê xwe, ji binê avê derdixist, bi peroş û meraqdarî me lê dinihêrî. Min dil dikir û dipam ku Selîm, di nav her du destên yekî ji wan de xuya bike. Wê rojê heta ku tarî kete erdê bi vî awayî li ser hev ketin avê lê mixabin kesî pêjna Selîm nekir.

Di wê gavê de, di nav wê tirs û payana bêhêvî de, Mamoste Necmî hate bîra min. Selîmê ku mamoste gelekî hez jê dikir, Selîmê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ku ji bo dilê xwe bi xwe neşewitîne, keça xwe ya ku ne dema wê ya hatina dibistanê bû, anîbû li nik wî rûnandibû, winda bûbû.

Mamoste Necmî, derbarê çêkirina bendavê de her tiştê neyinî ku dê li dû çêkirina bendavê bihate serê gund û gundiyan ji me re gotibû. Di her carê de, neyiniyên bendavê ji gundiyan re gotibû lê qey tu carî nehatibû bîra wî ku dê rojekê, yek ji zarokên gund di nav avê de winda bibe. Yan jî hatibû bîra wî lê wî ji ber ku nexwestibû tiştekî wisa bibe, negotibû. Û aniha mîna ku li hemberî min rawestiyaye û bi wî dengê xwe yî zelal û xweş ji me tevan re dibêje:

– Ne tenê mirina dar û bexçe û zeviyan, her weha, bendav dê bibe sedema mirina we jî.

Di ber xwe re, bi caran li ser hev diramim ku sedema çûna Mamoste Necmî ji gundê me jî ev bendav e. Ku wî gelekî li hember çêkirina bendavê derket lê mixabin bi ser neket.

Peyvek ji devê kesî ji me dernediket. Rûyê me tevan zer bûbû, mîna zerka hêkê. Me hemûyan xwe tawanbar didît. Li nik me, darî çavên me, Selîmê hevalê me, di nav ava bendava gundê me de winda bûbû. Me digot, “Winda bû.” Kesî ji me tu carê negot, xeniqî, yan mir. Nola ku dê rojekê li me vegeriya û bihata nav me; me digot, “Selîm winda bûye.”

Erê, bi rastî jî Selîm winda bûbû. Bûbû derziyek û ketibû nav bênderek kaya zer. Na na, ew bûbû gulokeke berfê û ketibû nav gola bnedavê.

Ji gundê Sarê, cendirme hatin. Cendirmeyên ku riya gundiyan birîbûn û nehiştibûn ji bo betalkirina bendavê biçin navçeyê. Ji navçeyê hin zilamên ku ciline ecêb li wan bûn hatin. Tûpekî mîna tûpê ku me li malê xwarin pê çêdikir, bi pişta wan ve girêdayî bû. Devê xortûmekê dikirin devê xwe û xwe berî nav avê dikirin. Piştî gerîna sê rojên, cendekê Selîm ji nav avê derxistin. Werimîbû, zikê wî bûbû mîna hebanekî.

Gava wan zilaman Selîm ji binê avê derxist, hemû gundî li serê kom bûn. Qîreqîra diya wî, metik û xaltiya wî diçû ezmanan. Por


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bi serê xwe ve nehiştin. Bavê wî, mîna nexweşekî, mîna yekî gêj, nedikarî li ser piyan raweste. Du zilam, her yek ji milekî ketibûne bin çengên wî, bi alîkariya wan li ser piyan dima.

Em zarok, li nêzîkî mezinan kom bûbûn. Me dixwest, hevalê xwe bibînin, Selîmê ku winda bûbû lê mirî hatibû dîtin. Zilaman nedihişt. Çend caran berî me dan. Dawiyê cendekê Selîm danîne ser tirimbêla cendirmeyan, ew birin navçeyê. Ber êvarî bû, cendekê Selîm anîne gund. Zilaman, gora wî, li nav goristana gund kolabûn. Em zarok jî li cem wan bûn. Heta kolana gorê xelas kirin, çavê me li wan bû.

Selim kiribûne hundirê depan. Zilaman ew li ser milên xwe dirêj kirin û heta cem gora ku kolabûn anîn. Selîm ji hundirê wan depan derxistin. Me bi çavên xwe didît, Selîm ji nav depan derxistin, xistin hundirê gora kolayî. Selîm, êdî di binê wê gorê de bû, gora ku mîna çalekê bû. Paşê ax avêtine ser. Hin bi hin gor tije dibû. Ez pir tirsiyam. Min li hevalên xwe nihêrî, di rûyê hemûyan de heman tirs xwe dabû der. Piştî ku gor tije ax bû, kevir li ser rêz kirin. Dûre, melayê gund dia kirin. Diayên mîna yên ku di mizgeftê de dikirin bûn. Paşê tev belav bûn. Tenê pîrek man li ser gorê. Pîrek gelekî digirîn. Hin zilam, bêtir jî yên ciwan, dar û çilo anîn. Dest bi çêkirina kolika taziyê kirin. Hinan jî bavê Selîm, ap û xalanên wî birin malên xwe. Piştî ku cendek dihate veşartin, gundiyan merivên ê mirî dibirin xwarinê.

Hevalê me Bahoz, hate cem min, got:

– Kekê Kato, ma bi rastî Selîm nema tê cem me?  Ma ew ê her tim li wir be?

Bêyî ku li rûyê bahoz binihêrim, min got:

– Erê Bahoz, ew nema tê.

Bahoz bi qasî çend salan ji min piçûktir bû. Tênedigihişt, an têdigihişt lê nedixwest bawer bike.

– Çima?

……………..


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

– Qey ew çû kû derê?

…………………..

Min dengê xwe nekir. Min dixwest bersiva Bahozê ku tirs û meraq ji awirên wî dibarîn, bidim. Lê min nedizanî, ez çi bersivê bidimê. Min nedizanî, ez çi bikim û çi bibêjim. Li ser bêdengiya min, Bahoz got:

– Çiya jî dibêje, Selîm nema tê. Kekê Kato, ma ew çû kû derê?

………………….

– Kekê Kato, ez dibêjim qey Selîm ji me xeyidiye, ji ber wê nayê.

Vê carê jî min tu bersiv neda Bahoz, lê pirsên Bahoz bi dawî nedibûn.

– Min jî ji Çiya re got, Selîm dê dîsa were gund. Ew ji gund jî, j ime jî pir hez dike. Ne wisa ye kekê Kato, bi rastî jî ne wisa ye?

– Belê Bahoz, belê wisa ye. Ew gelekî hez ji gundê me dikir. Hez ji me jî dikir. Em jî gelekî hez ji Selîm dikin. Selîm hevalekî çê bû.

Gewriya min ziwa bû. Çavên min şil bûn. Min berê xwe ji Bahoz guhert û ji cem wî bi dûr ketim. Ez tevî lehiya mirovên ku ji ser goristanê ber bi malên xwe ve diçûn, bûm.

Demsal havîn bû. Ji dar û çiloyê berû, kolikek hate çêkirin. Binê kolikê bi merş û beran raxistin. Balgih kirin rêz. Heta mehekê jî mêvanên ku dihatin taziya Selîm kêm nebûn. Ji serê sibê heta dema raketinê, mirov li binê wê kolikê rûdiniştin. Nîvro û êvarî, her roj du danan xwarin dihate pehtin. Serê kêliyekê, li ser sifreyên girover û mezin çayê û cixare li ber mêvanan dihatin gerandin.

Bavê Selîm mirovekî xizan bû. Ne zeviyên wî hebûn ne jî keriyên sewalan. Du serî çêlek û pênc şeş bizinên wan hebûn. Diya wî gelek mirîşk xwedî dikirin. Ji kê re hêk û dîk lazim bûbûya, diçû mala Selîm. Hêk ji mala wan kêm nedibûn. Diya min her tim digot:


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

– Li vê herêmê hemûyî, jineke mîna Delalê peyda nabe. Ew bi salan e zar û zêçên xwe, bi firotina hêk û mirîşkan xwedî dike. Ew bi keda şev û rojê, debara zarokên xwe dike.

Ne tenê Delala dayika Selîm, bavê wî Cindî jî mirovekî jêhatî bû. Bavê min ji bo wî digot:

– Xwedê jê razî be, Cindî jî mirovekî mîna moriyan e. Ji serê sibê heta ku roj diçe ava, ew bêhnekê jî ranaweste. Geh cotê xelkê dike, geh cenaniyê dike. Ëzingan hur dike, paleyî dike, bênderan didêre. Çi kar bikeve ber destê wî texsîr nake. Bêyî ku mineta kesî li xwe bike, nanê zarokên xwe peyde dike. Xwe muhtacî tu kesî nake.

Paşê diya min kesereke kûr dikişand û digot:

– Xwedê sebrê bide dayika wî ya feqîr. Lawo welehî gelekî zehmet e. Ku piştî Selîm, nexweşiyek di Delala reben de peyda nebe baş e. Xwedê me tevan, ji qeza û belayan biparêze.

Piştî ku çend kêliyan kûr û dûr difikirî, digot:

– Xwedê mala wan xera bike, ew ên ku bûne sedema çêkirina vê bendavê. Piştî zevî û bexçeyên me, dehlên me; gola bendavê, aniha jî zarokên me ji me distîne, wan dadiqurtîne.

Û weke her cara ku dibû qala Selîm hêstir ji çavên diya min ên piçûçik  dihatin xwarê. Bi desmala serê xwe, hêstirên çavên xwe ziwa dikir. Dûre dest bi strana xwe ya ku di her gavê de, bi dengekî nizim û di ber xwe re digot,  dikir. Ew distira yan digirî, tê nedigihiştim. Tenê dizanim bi dengekî şewat ku dilê mirovî diperitand, dinehwirî. Di ber re jî, kar û barê xwe yê rojane jî dikir.

Rojekê, em li  bênderên gund, bi gokê dileyistin. Piştî ku Selîm di gola bendavê de winda bû û xeniqî, me dev ji avjeniya di gola bendavê de berdabû. Ne ku em ditirsiyan, dilê me nedixwest. Lîstika me, kêf û xweşiya me tenê mabû lîstika gokê. Ku sê çar heval digihiştin cem hev, me dest bi lîstika gokê dikir. Ji nişkê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ve, me dît tirimbêleke spî hat, li cem me got xirt û rawestiya. Bi çavên meraqdar me li tirimbêlê û li yên di hundirê tirimbêlê de nihêrî. Ji nişkê ve, hemû zarok em li dora tirimbêlê kom bûn. Bi yek carê bû qîreqîra me, her yek j ime, ji hêlekê ve digot:

– Mamosteyê min, mamosteyê min, mamosteyê min...

– Memed, Memeddd...

– Gulşah, Gulşahhh...

– Mamoste Nazannn…

Ku ew di cî de, ji hundirê tirimbêle derneketana, hemû zarok em ê têketana hundirê wê tirimbêlê. Her çar, bi hev re, ji hundirê tirimbêlê xwe avêtin devre. Me dora Memed û Gulşah pêça, me ew hembêz kirin. Weke her carê, rûyê mamosteyên me biken bû.

Pêşi mamoste Necmî, dûre Mamoste Nazan, ez hembêz kirim. Bi yek carê laşê min lerizî. Ji kêfa min dikir ez bifirim, çavên min ji hêstiran şil bûn. Belê, ez ne şaş bûm, ne henek û ne jî xewn bû. bi rastî jî ew bûn; Mamoste Necmî, hevsera wî, Mamoste Nazan, Gulşah çi qasî mezin bûbû, bûbû jineke ciwan. Kurê wî Memo jî mezin bûbû.

Qêrînî bi me hemûyan ket. Me bi yek carê êrîşî wan kir. Dido dido, sisê sisê, em hembêz dikirin Mamoste Necmî. Xanima wî, keça wî, kurê wî yek bi yek hatin rûyê me. Lê ev xweşî pir dom nekir. Mamoste Necmî, bi baldarî li dora xwe nihêrî û got:

– Zarokno, ez Selîm nabînim. Selîm çima ne bi we re ye? Nexwe, piştî ku em çûn, hûn dîsa pê re nelîstin, ha de ka bibêjin, hûn bi Selîm re nalîzîn?

Bi yek carê ew kêf û xweşiya li ser rûyê me belav bû, xemginiyeke giran hat li ser rûyê me hemûyan venişt. Min hizir dikir ku bi mirina Selîm hesiyaye, loma hatiye gund Mamoste Necmî. Lê êdî em tê gihiştin ku mirina Selîm nebihistiye. Li ser soza ku dabû me, hatibû gund. Hatibû dîtina gundî û xwendekarên xwe.

Ew dîmena ku li polê mamoste kir û nekir, kesek li cem Selîm rûnenişt, ji nû ve hate ber çavên min. Weke vê kêliyê, her tişt


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

li ber çavên min zindî bû. Ji ber ku min jî nexwestibû Selîm li cem min rûnê, di her gava ku dihate bîra min de, ji şerman bi xwe diqehirîm. Min çawa tevgereke wisa xerab kiribû. Ji ber vê yekê tu carî min xwe efû nedikir. Mamoste Necmî ji bo ku Selîm tenê rûnenê, keça xwe yê piçûk a ku hîna ne dema çûna wê ya dibistanê bû, anîbû polê û di rex Selîmê pozlîçik de rûnandibû.

Û aniha, piştî sê salên ku ji gundê me koç kiribû, hatibû dîtina me. Lê mixabin Selîmê ku aniha mamoste lê dipirsî, êdî tune bû. Me dê çawa û bi çi awayî jê re bigota ku Selîm di nav ava bendavê de winda bû û dûre jî ew bi mirîtî ji binê avê derxistin.

Bi qasî mehekê di ser mirina Selîm derbas bûbû. Hê jî mêvanên ji bo taziyê yeko yeko dihatin û diçûn. Wê gavê jî, çend zilam di bin kolika taziyê de rûniştî bûn. Dûyê cixareyan weke her carê di ser serê wan re bilind dibû. Hîna me tiştek ji Mamoste Necmî re negotibû, ji binê kolikê, çend zilam bi me ve gihan. Yek ji wan kurê apê Selîm, kekê Mordem bû. Kekê Mordem, piştî bixêrhatinê, kete bin çengê Mamoste Necmî û berê wî da nav goristana gund. Her çar mêvan, matmayî li me dinêrîn. Kekê Mordem, bi dengekî nizim û lerzokî ku bi zorê deng gihabû ber guhê min, got:

– Mamosteyên delal xuya ye ku hûn pê nehesiyane. Mixabin berî mehekê, Selîm di gola bendavê de xeniqî.

Di wê gavê de, min bala xwe da her çaran. Yek bi yek, min tevgerên wan raçav kir. Bi bihîstina peyva mirinê re, rûyê Memed û Gulşah bûbû mîna desmaleke zer. Mamoste Necmî û Mamoste Nazan, di cî de, ji qidûm ketin. Ku Mordem bi çengên Mamoste Necmî negirtana, dê di cî de biketa erdê. Mamoste Nazan jî, destê rastê avête ser milê min, xwe bi b imin ve digirt.

Hîna axa li ser gora Selîm teze bû. Her çar mêvan li dora gorê, ji qelevîzka rûniştin. Serê wan di nav çengên wan de bûn. Her çar bê deng digirîn. Di binê tava havînî de, xwêdan ji eniya her çaran, dilop bi dilop dihate xwarê, tevî rondikên çavan dibû.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Bi vê bêdengiyê, em çi qasî li ser gorê rawestiyan, nizanim. Lê wisa bi min dihat ku em bi saetan wisa bê deng li ser gora Selîm man. Ku Mordemê pismamê Selîm, nekete binê çengê Mamoste Necmî û ranekirana, ez nizanim, em ê heta kengê li wê derê wisan bimana.

Em tev bi hev re çûne binê kolika taziyê. Gava diya Selîm Mamoste Necmî dît, tavilê dest bi girî kir. Gireyekî ku dilê me tev pê êşiya. Em tev li binê kolikê rûniştin. Kesên ku hatina Mamoste Necmî bihîstin, di cî de hatin binê kolkê. Sê sal li dû çûna wan ya ji gund derbas bûbû. Gelek tişt hebûn ku me dixwest em ji wan re bibêjin. Gava ew çûn, ez derbasî pola pêncem bûbûm. Niha jî ez xortekî pazdeh salî bûm.

Di binê çavan re, ez û Mamoste Necmî li hev dinihêrîn. Min dixwest gelek tiştan jê re vebêjim. Xuya bû ku wî jî dixwest gelek tiştan ji min bipirse lê xemginiya Selîm devê her kesî girtibû. Ken ji ser rûyan, kêf ji dilan biribû.

Hevalên me xemgîn bûn lê mirina Selîm, ne tenê xemgînî anîbû. Ji ber tevgera me ya di dibistanê de ku Mamoste Necmî geh bi xweşikayî, geh bi xeyd ji me re gotibû lê tu kes li cem Selîm rûneniştibû, aniha poşmaniyeke pir mezin bi her kesî re peyda kiribû. Ez di her gava ku tê bîra min de, dikevime nav poşmaniyeke ku min gelekî xemgîn dike. Ez dikevime nav xewn û xeyalan. Xwezî ew roj ber bi paş ve bihata. Min tiştekî wisa nekirana. Ez dizanim hemû heval di vê rewşê de bûn. Ji şerman kes ji kesî re nabêje. Lê ji rûyê her kesî diyar e ku em ji wê tevgerê poşman û fedîkar in.

Ma çi dibû ku Selîm xîzan bû. Ma xizanî sûcê bavê wî yê belengaz bû. Ma bi dilê wî bû ku pêlavên wî qetiyayî bûn. Ma ku cil û pêlav qetiyayî bin çi ji mirov kêm dibe. Û pozê wî, pozê wî yê ku bênavber, bi ser lêvên jor ve diherikî, hingî bi me nexweş dihat. Xwezî Selîmê hevalê me nemiribana, bila cil û pêlavên me tevan qetiyayî bûna. Bila ne tenê pozê Selîm, bila pozê me hemûyan biherikiyana.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Mamosteyên me sê roj û sê şevan li gundê me bûne mêvan. Ev mal bi mal digeriyan. Bi mezinan re diaxivîn. Em  jî bi keça wan Gulşah û kurê wan Memed re, li nav bexçe û rezên gund ên ku ji ber ava bendavê filitîbûn, geriyan. Hin bexçeyên gund di binê avê de mabûn. Zevî jî wisa. Ew darên fisteqan ên ku bi pêşberiya Mamoste Necmî hatibûn tehimandin. Me Memed û Gulşah li kerê siwar kir. Paşê Gulşah li hespê me jî siwar bû. Memed nediwêrî li hespî siwar bibe. Ew ji pişta kerê nehate xwarê. Wan, makîneyeke fotografan bi xwe re anîbû. Gulşah ez fêrî kişandina fotografan kirim. Me gelek fotograf kişandin.

Wan ji me re got ku dê û bavê wan bêtir ji bo dîtina Selîm hatibûn. Lê mixabin bûyera ku pêk hatibû dilê her kesî êşandibû.

Mamoste Necmî û Mamoste Nazan, ji bo çend kêliyan bûne mêvanê mala me jî. Pirsa kalê min kirin. Bavê min got:

– Bila dost û hazir sax bin, piştî çûna we bi salakê, jiyana xwe ji dest da. Pir kal bûbû. Ji dest û piyan ketibû. Her roj nexweşiyek xwe tê de dida der. Dermanên ku doktor didanê jî bi kêr nedihatin.

Her du mamoste bi hev re gotin:

– Bila serê we sax be. Lê em li hatina xwe poşman bûn. Ji bo dîtina we em hatin gund lê mixabin me gelek nûçeyên neçê bihîst.

Bavê min, ji aliyekî qehweya li ber xwe vedixwar, ji aliyekî jî bi mêvanan re diaxivî:

– Mamosteyên delal, dinya tiştekî wisa ye. Hin diçin, hin tên. Jiyan jî wisa; geh xweş e, geh biêş e. Mirov carinan dikene, bikêf û bextewer e; carinan jî digirî, xemgîn û bikeder e. Her gav, weke dilê mirovî nabe.

Xatir ji me xwestin û wê gavê rabûn ji mala me çûn. Dotira rojê jî, hemû gundî, li qada gund kom bûn. Qada li tenişta dibistana me. Mamosteyen me, yek bi yek xatir ji hemû kesên li wê derê amade, xwestin. Li tirimbêla xwe siwar bûn û bi riya xwe ve çûn.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Gava min û mamosteyê min Necmî xatir ji hev xwest, hêstirê çavên min, hatin xwarê. Çavên mamoste jî tije bûbûn. Min ji nêrînên wî fêm dikir. Bi her du destan ez hembêz kirim, rûyê min maç kir û çû...

Mamoste Necmî û malbata xwe çûbûn. Selîm hin bi hin dihate jibîrkirin. Her kes di kar û barê xwe de bû. Bêndar dihatin hilanîn. Ce û genim diketin embaran. Ka dikişandin kadînan. Bavê min kadîna me tije ka kiribû. Ce û genim hêrtibûn û kiribûn çewalên mezin. Çilo jê dikirin, li çiyê, li cihên nêzî gund dikirin cêzî.

Diya min li serê banê me, sêv, hirmê raxistibûn. Ën ku hişk dibûn dikirin sebet û kîsan. Îsot û bacanên reş bi derziyê bi ta ve dikirin û li ber tava rojê hiladiwestin.

Bi rojê em ji lîstikê têr nedibûn. Em zarok, bi şev jî li bênderên gund dihatin ba hev. Em bi çirê dilîstin. Em lîstika dîk û mirîşk dileyistin.

Her demsal li gorî xwe xweş bû. Havînî piranî em li derve, berî bendav çêbibe li keviya bestê, niha jî li ber ava bendavê. Lê piştî ku hevalê me Selîm di nav avê de winda bûbû, em ji ava bendavê sar bûbûn. Mezinên me êdî nedihiştin em têkevin avê.

Zivistanan jî çîrok hebûn. Çîrokên ku bapîr û dapîra min di şevên dirêj ên zivistanê de, li ber sobeya êzingan ji me re digotin. Ëzingên berû, sobeya sacînî sor dikirin. Sobeya sacînî hundir germ dikir. Germa hundir laşê me sist dikir. Bapîr û dapîra min, bi vegotinên xwe, bi çîrokên xwe, em li ser ewrên xeyalan siwar dikirin. Ji ser wan ewran me çi didît û me çi nedidît. Geh tirsa ajalên kûvî laşê me dilerizand, geh em bi tevger û bikêriyên ajalan matmayî dibûn.

Jixwe min gelekî çiyayên gundê me, pişt çiyayan û her weha jiyana li çiyayan meraq dikir. Me ji mezinên xwe gelek çîrokên ajalan bihîstibûn. Çîrokên rûvî, kîvroşk, gur, baraz, bêtir jî hirç. Nêçîrvan çîrok li dû hev rêz dikirin. Bavê min digot.

– Pir guh nede gotinên nêçîrvanan.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Min ji gelek kesan bihîstibû ku nêçîrvan deruwan dikin, derewên gelekî gewre, loma min ji bavê xwe pirsîbû:

– Çima bavo, ma nêçîrvan rast nabêjin?

Bavê min bersiv neda min. Min dîsa pirsî:

– Bavo, qey nêçîrvan derewan dikin, ji ber wê, tu dibêjî guh nede wan?

Vê carê mîna ku mecbur ma, pirsa min bersivand:

– Lawê min heke derewan nekin jî, ew tiştan pir mezin dikin.

– Çawa?

– Yekê dikin çar.

Çi qasî min dixwest, tiştên ku nêçîrvan ji me re vedigotin, bi çavên serê xwe bibînim. Wan ajalan, rasterast, zindî bibînim. Gelo rojekê, ez û hirçek ji nişkê ve, li cihekî rû bi rû bimana, min ê çi bikira, ew ê çi bikira?

Lê mezinan digot, hirç bi rojê nayên nêzî gund. Ew bêtir bi şevê digerin. Lê ku di tariya şevekê de, an di reşahiya êvarekê de, em rastî hev bihata? Ji niha ve laşê min dilerizî. Dilê min dikire kupekup.

Apê Zana di axaftineke xwe de ku bi mezinan re kiribû û min jî bi baldarî guhê xwe dabûyê lê guhdarî kiribû de gotibû:

– Hirçê, sê caran deriyê kozika mirişkên me şikand. Derî darîn bû. Bi keviya dêrî digirt û bi ser xwe de kaş dikir. Cara dawî, min bi van çavên serê xwe dît ku derî kir du perçe û noqî nav mirîşkan bû. Bi stûkra du mirîşkan girt û berê xwe da nav daristanê.

Xalê Derwêş jî sond dixwar û di pey sonda xwe de digot:

– Hirçê hatiye, derketiye ser dara qeresî. Bi wan lepên bipirç, yek bi yek qeresiyên sor î pembe avêtiye devê xwe. Min bi dar û çiloyê berû, dora darên qeresiyan sênc kir lê dîsa hirçê hatiye û ew sinc ji hev bela wela kiriye. Dawiya dawî, min ji navçeyê têla bidirî anî, lê dîsa jî hirçê dev ji xwarina qeresiyan berneda.

Apê Zana digot:


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

– Malmîratê, mirîşka ku bi dest dixe, di cî de naxwe. Ew axê dikole. Mirîşka ku bi lepên xwe kuştiye, dixe binê axê. Çend rojan li wê derê dihêle. Ku bêhn û pixar pê ket, hîna nû tê ji binê axê derdixe û dixwe.

Mamoste Necmî jî carekê li dibistanê ji me re vegotibû. Şevekê dema ku derketiye hewşa dibistanê, dîtiye ku reşahiyek ji daşira dibistanê derdikeve. Gava bala xwe dayê, dîtiye ku wa ye hirçeke gewr, ji daşira dibistanê derdikeve.

Carekê zilamê gund, li binê siha dara tuyê rûniştibûn. Dîsa mijara wan ajal û nêçîr bûn. Bedoyê nêçîrvan got ku, rojeke ji rojên biharê bû. Dinya xwe ji serma û seqema zivistanê rizgar kiribû. Hin bi hin hewa germ dibû. Hema bêje her roj baran dibarî. Pir caran, mij û dûman bû. Di rojeke wisa bi mij û dûman de, hin nêçîrvanên nas ji bajêr hatine. Ew bi hev re çûne nêçîrê. Bûyereke zehf ne xweş qewimiye. Di nav wê mij û dûmana tarî de, nêçîrvanan hevdu neditiye û bi xeletî, nêçîrvanekî, hevalê xwe yê nêçîrvan kuştiye. Piştî vê bûyerê, careke dî, nêçîrvanên bajêr nehatine gundê me. Û ev bûyer, weke bûyera Selîm tu carê ji bîra gundiyên me nediçû.

Di heman kêliyê de, Qadoyê nêçîrvan jî li ser hirçan axivî. Wî got ku mirov gule bernede eniya hirçê yan dilê wê, ew tu carê bi guleyan nayê kuştin. Jixwe çermê wê, ew qasî qewîn, goştê wê jî ew qasî qelew û birûn e ku zû bi zû gule tê re naçin.

Hinan digot, hirç mirovan sax digirin û direvînin çiyê. Hinan digot, hirç gelekî birik in û divê mirov li gira wan neçe.

Hîna min hirçên sax û zindî nedîtibûn. Rizgoyê kurê Bedoyê nêçîrvan hevalê min bû. bavê wî postê hirçekê bi kayê tije kiribû. Ji şiv û daran jî ling jê re çêkiribûn. Mîna ku sax bû li ser piyan radiwestiya. Çi cara ku ez diçûma mala wan, min bi mista destê xwe, pirça wê miz dida. Mirî be jî, tirs dikete dilê min. Lê dîsa jî min gelek ji hingavtina hirça mirî hez dikir. Lê ku diya Rizgo, meta Xecê em didîtin, bi me diqêriya, digot:

– Kuro min çend caran ji we re gotiye ku dest nedine vê hirçê. Dîsa we hundir tije pirç kir. Çengê min qerimîn bi maliştinê.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Hirça li mala hevalê min Rizgo mirî be jî, hundirê wê tije ka be jî, bi wê heybeta xwe tirs dikire dilê mirovan.

Roj li dû hev dihatin û diçûn. Meh, sal pêk dianîn. Sal jî temenê me mezin dikirin. Dest û piyên me, bedena me gir dibû. Xewn û xeyalên me diguherîn. Hin xeyalên me dibûne rastîn. Ëdî min xeyala bajarên mezin û dûr dikir. Kalê min jî, mamosteyê min jî, qewêtî li min kiribûn ku ez li pey dibistanê biçim, dev jê bernedim.

Ëdî ne hewce bû ku ji mezinên xwe bixwazin, da ku me bi xwe re bibin çiyê, nêçîrê, avjeniyê, nêçîra masiyan... Her yek ji me xortekî jîr bû êdî. Keçikên xama li benda me, em jî tim li dû wan bûn.

Em diçûne çiyê, di demsala biharê de me kuvarok dianîn, payîzî bi tûrikên tije giwîj û tihokan em vedigeriyan malê. Hin kes hêkên kewan ji hêlînan dianîn. Min gotinên Mamoste Necmî dianîn bîra wan. Wî her tim digot:

– Hemû zindî xemla xwezayê ne. Divê em alîkar û parastvanên wan bin. Em çûkan nekujin. Kewan negirin. Heta bi maran jî sûde didine xwezayê û her weha sûde didine me mirovan jî.

Dema mamoste Necmî vê ji me re gotibû, hevalê me Rizgo gotibû:

– Mamosteyê min, min kew fêhm kirin, ew ajalên xweşik in, deng û xwendina wan pir xweş e, goştê wan jî tê xwarinê lê min fêm nekir gelo mar çawa sûde didine me mirovan û her weha xwezayê.

Li ser vê yekê Mamoste Necmî di wê waneyê de û di waneyên dû de, taybetmendî û raza ajalan yek bi yek ji me re vegotibû. Li ser pirsa Rizgo, derbarê maran de jî weha gotibû:

– Mar, hêlînên xwe di bin axê de çêdikin. Ew mîna gêsin axê tev didin. Bi vî awayî, ax hewa distîne. Ax bêtir riweken hildiberîne. Û ku ne ji maran bûya, dê mişk êrîşî me kirana. Xwarina maran a sereke mişk in. Ku mar wan nexwin, mişk jî raya zerzewatên mîna kartol û pincarê, pîvaz, sîr û hwd dixwin.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Li ser vê yekê hevalê me Çeto gotibû:

– Mamosteyê min, baş e, min ev têgihiştin lê jehra maran?

Li ser pirsa Çeto jî Mamoste Necmî weha gotibû:

– Rast e, jehra maran heye. Û jehra maran mirovan dikuje. Lê divê em vê yekê jî bizanin û jibîr nekin: Mar, xwe bi wê jehrê diparêzin. Heta ku xwe di xetereyê de nebînin, ew vê jehrê bikar nayinin. Lê gava ku dîtin dê xisar bigihe wan, hingê xwe bi wê jehrê diparêzin.

Paşê jî hevalê me Cindî axivîbû:

– We di waneyekê de gotibû ku, dest û piyê mirovan hene, qiloçên bizinan hene, paqên dirêj û bihêz ên hespan hene, diranin gur, pisîk, şêr û pilingan hene, her weha per û baskên firindeyan hene; heçî mar e ji bilî wê jehrê tu tiştê wê nîn e.

Mamoste Necmî, bi ser gotina Cindî zêde kiribû:

– Û di serî de mirov, jîjo, baz, eylo, hemû firinde li cihê ku dibînin, êrîşî maran dikin.

Bi saya zanîn û fêrkirinên Mamoste Necmî, ez bûbûme dostê ajalan. Min bi firçeyê pişta kerê me paqij dikir. Min birînên ku li pişta wî vedibûn, derman dikir. Min berxik û kavir dibirin qiraxa bendavê, min ew diavêtin nav avê û heta mîna berfê spî dibûn, dişûştin. Min hêkên ku diya min ji bo çêlîkên elokan kelandibûn, diqeşartin, hûr dikirin û datanîne ber çîçikan. Min nanê germ bi rûnê malê rûn dikir û dida seyê me Siwar. Min bi kulman ce û genim dibir, li ber devê hêlîna moriyan vala dikir.

Rojeke betlaneyê yê biharê bû. Rûniştina li ber tava rojê çi qas xweş bû. Dinya hin bi hin germ dibû. Berfa li serê çiyayan hêdî hêdî diheliya. Dû ji axê diçû. Gundî jî hin bi hin ji bin tiraliya zivistanê derdiketin. Mêw dihatin kesixandin. Dar (birale) dihatin danîn. Kar û berx derdixistin devre, li nav zûrçikê diçêran. Golikên salê, li bênderan lotik didan.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Piştî çend rojan dê gundî dest bi merdana rezan, kolana bexçeyan bikin. Dê cotkaran, gêsin û misasên xwe tûj bikin. Ëdî dem, dema cot e. Wextê danîna şitlên zerzewatan e. Ku havîn hat, dinya xweş germ bû, firingî dê sor bibin. Firingiyên tirş û biav. Dûre, êrûg, mişmiş, tirî, zebeş û petêx. Tiriyê reş, sor û zer. Hêjîrên her yek bi qasî sêvekê yên mîna hingiv. Sêvên sor û zer, ji şekir şîrîntir. Hermê, hermêyên gir û şîrîn ên ku ava devê hirça diherikînin.

Di bin tava biharê de, li ber deriyê mala me, li ser taîja mûyî, serê min li ser balgihê, giştî ez bi xew ve biçûma. Ji nişkê ve rabûme ser xwe. Min pêlavên xwe kirin lingê xwe û berê xwe da besta ku bê rawest ava xwe dianî berdida bendava ku ji roja hate çêkirin, her tiştê me guherand. Best û best, ber bi avzêmka bestê ve diçûm.

Kalê min, Selîmê hevalê me ku bû qurbanê bendava bêyom, Mamoste Necmî, hevsera wî Nazan, keça wî Gulşahê, kurê wî Memed; mina ku ew jî bi min re ne û em geh di nav heriya biharê de û geh li ser lat û keviran  dimeşin.

Gava ez gihiştim nik dara gûzê, dara mala apê Bedo, Bedoyê nêçîrvan, bavê hevalê min Rizgo; tavilê rûniştim û min pala xwe da lata fireh a li binê darê û berê xwe da tava rojê. Min çavên xwe miç kirin. Ketim nav deryaya xeyalan. Min dixwest dîsa weke her carê li wan ewran siwar bibim û biçim û hey biçim. Mîna gava ku min ji kalê xwe dipirsî, min digot ev, çiya, ev best diçe heta kû derê?  Wî jî di her carê de, tenê digot, “diçe û hey diçe...”

Piştî meşa di nav herî û keviran de westiyabûm û tava biharê jî ez tevizandibûm. Çavên min çûbûne ser hev. Ji nişkê ve dengê orînekê hate ber guhên min. Hêdî hêdî min çavên xwe bal kirin. Dîtina min dît ku hirçek û du çêlîkên xwe li  raserî bestê ne. Çêlîkên hirçê bi kêf diçine vî alî û wî alî. Hirça dayik jî, çavên xwe di nav ava bestê de kutane. Besta ku bi ava berfê dîn û har bûbû. Av, ew qasî xurt bûbû ku kevir li ber xwe dibirin û di nav ava sor de, dibû şeqeşeqa keviran.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Hirçê ez nedidîtim lê min hemû tevgerên wê dişopand. Piştî qasekê, hirçê rahijte çêlîkeke xwe, kire ber sînga xwe û berê xwe da nav ava bicoş. Gava giha bestê û kir ku lingê xwe je  nav ava sorî çoravî, çêlîka din jî hate nik û kir xwe bavêje nav ava bestê.

Hingê hirçê bi qehr li çêlîka li ser erdê zîvirî û da pey heta ku ji avê dûr xist. Lê cara duyem gava ku kir çêlîka di ber sînga xwe de derbasî hêla dî bike, çêlîka li ser erdê, dîsa xwe gihande wan. Vê carê, hirçê çêlîka li ber sînga xwe danî erdê. Kevirekî bi qasî zebeşekî Amedê girte her du lepên xwe. Çêlîka ku bi ya wê nedikir û dida dû wan, li erdê dirêj kir û kevirê nehîte danî ser qemçik û pişta wê. Hirça çêlîk gelekî li ber xwe da ku xwe ji binê wî kevirî derxîne lê hemû tevgerên wê bê sûde bûn.

Wê gavê hirçê, bi dilrehetî û bêyî ku bilezîne, çêlîka dî di ber sînga wê de, di nav ava sor ya besta har û dîn re, derbasî hêla dî bû. Çêlîka li ber sînga xwe danî erdê û berê xwe da cihê ku jê hatiye, da çêlîka xwe ya dî jî, ya di binê kêvirde remidandî derbasî vê hêlê bike. Gava ku lingê xwe dirêjî nav avê kir, dît ku vê carê çêlîka ku derbas kiribû dike xwe bavêje nav ava ku keviran jî di ber xwe re dibe. Tavilê lepên xwe dirêjî çêlîkê kirin, çend gavan ji avê dûr ket. Destê xwe dirêjî kevirekî mîna kevirê ku li hêla dî li ser milê xweha wê ye û danî ser pişta wê. Çêlîka reben, çend dengan kire oreor lê mixabin, kevir ji cihê xwe neleqiya jî.

Hirça gewr xwe li avê xist çû çêlîka dî ji binê kevirî derxist û derbasî cem çêlîka xwe ya dî kir. A dî jî ji binê kêvir derxist û bi aramî berê xwe dane nav daristanê.

Ëvar nêzîk dibû. tîrêjên rojê, hin bi hin lawaz dibûn û roj ber bi pişta çiyayên bilind ve diçû. Ez ji ser lata pehn ya li bin dara gûzê rabûm. Hêdî hêdî min berê xwe da malê. Dîtina hirçê ku weke hesretekê di dilê min de bû, ez kêfxweş kiribûm. Gotina bavê min a ku digot, “Guhê xwe nede nêçîrvanan, ji ber ku ew tiştan mezin dikin.”  hate bîra min. Gelo gava  hirça ku îro min dît, ji mirovan re vebêjim, dê ji min bawer bikin. Rastiya ku min bi çavên serê xwe dîtibû, gelo dê pê bawer bikirana?


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

* * *

Meraqa min a li ser cîhana ajalan kêm nebûbû, bêtir zêde bûbû. Tevî xeyala bajarên mezin û dûr, xwendina dibistanên mezin; di dil û mêjiyê min de dimeyiyan û xewn û xeyalên min dineqişandin. Ez ji nû ve, li ewrên xeyalan siwar bûm.  Dengê kundekî ji dûr ve dihat, beqên bestê û yên di gola bendavê de, dengê xwe digihandin hevdu. Eyloyek, bi zehmetî di asîmanê ku hin bi hin tarî dibe de, perê xwe li bayê sivik ê vê êvara hênik dixistin.

Çavên min giran dibin, ez noqî nav xewa germ dibim. Kalê min, riha wî mîna berfa li serê çiyayên dora gundê me, spî ye. Tizbiha dirêj a ku her tim di destê wî de bû, dîsa pê re ye. Pala xwe daye balgiha ji hirî. Qirçeqirça êzingên hişk ên berûyî di sobeya sacîn de. Weke her carê, min çoka kalê xwe ji xwe re kiriye balgih. Ne bi dido û çaran, bi sedan guhî guhdarê wî dengê xweş im.  Kalo çavên xwe li hundir digerîne, bapîr ne li vir e. Ku li hin cihan xwe şaş bike jî, qet ne xem e. Bi dilekî rehet dest bi çîroka xwe dike:

– Hebû û tune bû. Gundiyekî tiral hebû. Wê salê zeviyê xwe kiribû ce. Havîn hatibû, ceyê wî hişk bûbû, dema çinînê bû êdî. Serê sibehekê, rahijte dasa xwe û çû li serê zeviyê rawestiya. Li her çar hêlên zeviyê nihêrî. Bi dengekî bilind got, îro, ez ê heta bi wî seriyî biçinim. Roja dî jî ez ê nîvî xelas bikim. Roja çaran tayek ceyê neçinî nahêlim. Kîvroşka belek jî weke her salê,  hêlîna xwe di nav zeviyê ceyê ku digiha noqa zilaman de çêkiribû. Çêlîkên wê piçûçik bûn. Gava dengê xwediyê zeviyê hat ber guhê wan, hemû bi yek carê, gotin, dayê dayê ku ceyê xwe biçine, dê me bibîne û me bigire, zû em ji vê derê birevin. Kîvroşkê xwediyê zeviyê ji salên berê nas dikir. Gote çêlîkên xwe, hele sebir bikin, hîna dinya hinekî hênik e. Piştî demekê dinya germ bû. Xwêdanê di eniya zilamî re herikî. Bi şid, dasa di destê xwe de avête nav cê û bi bayê bezê berê xwe da malê.

Dotira rojê, heman tişt bû. Dîsa got, ez ê vir û wir biçinim û roja çaran…


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Çêlîkên kîvroşkê dîsa kirin kazekaz û ji diya xwe xwestin ku wan ji nav vî ceyî derxîne. Lê ku dinya germ bû gundiyê tiral dîsa dasa xwe avêt û xwe gihande mala xwe. Roja sisiyan, bi dengekî bilind got, ev bêxwediyê ce, li serê min bû bela, tu carê bi çinînê xelas nabe. Ya baş ew e ku ez agir berdimê, di navbera çend xulekan de tayek jê namîne. Hîna çêlîkan devê xwe venekiribûn, diya wan got, de vêca ev rast e ha! Zûka rabin, em ji vir derkevin.

Çavên xwe digirim xewnên şêrîn, çavên xwe vedikim ewrên xeyalan…

Û ez, siwarê ewran, min qet nedixwest peya bim, qet…

Pûşpera 2013an– Amed


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org